٥ - مرام داؤود – تجمع عهد الكرامة والحقوق

٦- زيد العاصي- الكتلة الديمقراطية السورية (أحمد الجربا)

٧ - كريم الدين فاضل فطوم – حزب البعث الديمقراطي الاشتراكي العربي- الداخل

٨- عبد القادر الموحد – حزب الحداثة والديمقراطية (فراس قصاص)

٩- المحامي علاء الدين الخالد – التحالف الوطني الديمقراطي السوري

١٠- احمد اعرج – التحالف الوطني الديمقراطي السوري

١١- فيدان بريم – (روان محمد) – التحالف الوطني الديمقراطي السوري

١٢- ممثل مجالس مناطق الشهباء – ريف حلب

١٣- إيشوع كورية – حزب الاتحاد السرياني

١٤ - شاميرام شمعون الاتحاد السرياني

١٥ - المحامي ماجد يحي- الاتحاد السرياني

١٦ - محمد موسى – الحزب اليساري الكردي في سورية

١٧ - روجين رمو – ممثلة المرأة

١٨ - العقيد علي حجو – عن منطقة جرابلس

١٩ - سيهانوك ديبو – حزب الاتحاد الديمقراطي

٢٠ - حكمت حبيب – الهيئة الوطنية العربية

٢١ - مصطفى محمد مشايخ – حزب الوحدة الديمقراطي الكردي في سورية (اليكيتي)

٢٢ - والل مرزا- الحزب الاشوري الديمقراطي

٢٣ - طلال محمد – حزب السلام الديمقراطي الكردي في سورية

٢٤ - مزكين زيدان – حزب التغيير الديمقراطي الكردستاني

٢٥ - فرهاد تيلو – الاتحاد الليبرالي الكردستاني

٢٦ - خنساء حمود – مكتب المرأة العربية

٢٧ - نوال المزيد – مستقلة

٢٨ - عبد الرزاق محمد الطائي- المجلس الديمقراطي للعشائر العربية في الجزيرة

٢٩ - إلهام احمد – حركة المجتمع الديمقراطي

٣٠ - عامر هلوش السالم – رجل اعمال مستقل

٣١ - جهاد محمد عمر- حركة المجتمع الديمقراطي

٣٢- فوزي شنكالي- حزب الوفاق الديمقراطي الكردي السوري

٣٣- امجد عثمان – حركة الاصلاح -سوريا

٣٤ - ابراهيم الحسن – تل ابيض – تركماني

٣٥ - بيريفان احمد – الشبيبة

٣٦ - فارس عتو شمو – البيت الايزيدي

٣٧ - فهد دقوري- مجلس العشائر الكردية

٣٨ - جيهان خدرو – مناطق الشهباء

٣٩ - جمال شيخ باقي – الحزب الديمقراطي الكردي السوري

٤٠ - ناصر الناصر – مستقل

٤١ - بسام سعيد اسحاق – المجلس الوطني السرياني– اوروبا

٤٢ - حسني خميس – مستقل

٤٣ - ممثل المبادرة الوطنية لجبل العرب

كما انتخبت الهيئة السياسية لمجلس سوريا الديمقراطية هيئة رئاسية مشتركة ضمّت تسعة أعضاء وهم: ايشوع كورية، مرام داؤود، ابراهيم الحسن، روجين رمو، أحمد الحبيب، بيريفان أحمد، جمال شيخ باقي، علاء الدين خالد، وصالح نبواني.

كما انتخبت الهيئة كل من أمين عام تيار قمح هيثم مناع وعضو الهيئة التنفيذية في حركة المجتمع الديمقراطي إلهام أحمد كرئيسين مشتركين لمجلس سوريا الديمقراطي.

ويأتي هذا المؤتمر – حسب المراقبين – في إطار الجهود الرامية لتوحيد صفوف المعارضة السورية ومحاولة تأسيس مشروع سياسي جديد للانتقال بسوريا من العنف والتطرف والاستبداد إلى دولة المواطنة والمؤسسات، يتمتع فيها المواطن بكافة حقوقه المشروعة في ظل سوريا ديمقراطية تعددية لا مركزية، وإخراج البلاد من النفق المظلم الذي دخلته منذ خمس سنوات، لتحقيق آمال وتطلعات الشعب في الحرية والعدالة والكرامة، والتأسيس لبناء نظام ديمقراطي شامل.

تقرير: فنصة تمـــو

بورتريه فشة خلق ...

زاوية يكتبها: حسن اسماعيل

من ديرك إلى الرياض هلّت البشاير..

كأيّ سوريّ يحمل أعباء خمس سنوات متعاقبة من الحرب والموت والدمار والدم أنتظر بشغف وأمل أن يكون القادم أفضل وأن يكون هناك بصيص من النور في نهاية نفقنا السوري المظلم، من كوبي عنان مرورا بالأخضر الابراهيمي ووصولا إلى ديمستورا ... من باريس وجنيف وفيينا وموسكو والرياض وبالنهاية ديرك المدينة التي أسكنها والتي تعاني من متلازمة الغلاء والحصار والنزيف البشري خارج الحدود.

لم يعد العقل البشري يستوعب حجم المؤتمرات والاجتماعات واللقاءات التي عقدت على مدار السنوات الخمس لإنهاء مسيل الدماء السورية ولا كمية البيانات والتصريحات التي أطلقها قادة العالم ومدى التناقض والارتباك فيها.

لا مستقبل للأسد في سورية ... لا يمكن القبول بأي دور للأسد في سورية الغد ... يمكن اعتبار الاسد جزءا من الحل السوري ... يمكن الوصول لاتفاق يوقف الدم دون رحيل الاسد ...

العاصمة السعودية الرياض والتي احتضنت مؤتمر المعارضة السورية وجمعت الأطياف المتنوعة من الائتلاف والتنسيق والبناء وخبراء التجميل والقفز وبناء الأجسام وكل من لاقى الرضا من مقام المملكة من الساسة والعسكريين سواء كان معارضا أو مؤيدا أو من النخبة المبشرة بالريال.

لا أعلم كيف تم اختيار هؤلاء وما هي المِيَزات التي توفرت فيهم ليقرروا مصير أمة ويحاوروا سفاح دمشق ويبيعوا الوطن والشعب والدم والحرية بأبخس ثمن وكيف تمكن جهابذة الكرد في المؤتمر من نزع هذا الحجم الهائل من التمثيل والاعتراف بالحقوق القومية والعامة للشعب الكردي لدرجة أذهلت الجميع ورضي عنها عموم الشعب السوري من عرب وتركمان ومسيحية ولم يسخط سوى الكرد

...وفي النهاية تشكلت لجنة لتحاور وتدخل حلبة الصراع مع النظام والمجتمع الدولي والمخلوقات الفضائية والمائية، وبالنهاية، تقوا ستعلن فشلها وذلك بعد عشرات الاجتماعات الناجحة والمثمرة والتي كلفت المانحين الملايين من الدولارات وكلفت الشعب السوري المزيد من الموت والدمار

في المقابل ديرك مدينتي القابعة على ضفاف دجلة تحتضن مؤتمر سورية الديمقراطية وتهلّل للأبطال المعارضين من قيادات المجتمع الديمقراطي في الإدارة الذاتية الديمقراطية من وكتلة المرجعية وشيوخ العشائر الديمقراطية من شمر وجبور وطي وشرابية ودقورية وكوجرية ويتباهى مطار قامشلو القابع تحت سلطة المخابرات السورية باستقبال الوفود وتوديعها دون أن يعلم المدعوون بأن مريض السرطان من أبناء المحافظة يحتاج للحصول على تذكرة إلى دمشق إلى تقبيل الأيادي ودفع « كم ألف رشوة » والانتظار في العراء القارس عشرات الساعات ... غريب عجيب..!

المؤتمر كان ناجحا بامتياز وحقّق الآمال في ضمان الحل السوري عامة الكردي خاصة، لاسيما تثبيت الديمقراطية التي أصبحت العنوان الأهم فالمجتمعون كانت وجباتهم ديمقراطية وحديثهم ديمقراطي ولباسهم ديمقراطي ومكان إقامتهم ديمقراطي وبالنهاية عند سؤالهم: لمَ لمْ يتمّ اعتماد العلمانية كسمة للدولة المعهودة؟ كان الجواب ديمقراطيا بأن الديمقراطية أشمل، وكأنهم يجهلون بأن العلمانية صفة للدولة والمجتمع والديمقراطية وسيلة وأداة ... شي غريب عجيب هالديمقراطية لدرجة التخمة..!

كل ما أعلمه أن السوري مازال كرة تتقاذفها الأرجل، ولا يمكن لأحد أن يتكهّن في أي مرمى تنتهي هذه الكرة ... أتمنى لكم مستقبل علماني ديمقراطي حقيقي..

bûyer

Nûçe... Bi Zelalî PRESS

www.buyerperss.com buyerperss buyerperss buyerperss@gmail.com WhatsApp 00905368908545

Rojnameyek Siyasî- Civakî- Çandî- Serbixwe-Nîvmehane

2

Hejmar /33/ 15-12-2015 Buhayî PS 50

Sergotar

Her Yek Ji Me Xwedî Çend Nasnama ye!!!

Di xelîtik û berîkên me de, em Kurdên Rojavayê Kurdistanê bêtir ji nasnameyekê heye, û ji xwe nasnameyên nû xweşki in, û diberiqin, û bi gelek zimanan jî li ser hatiye nivîsandin.!

Berî ku şoreşa Sûriyê serê xwe hilde ev çanda çêkirina nasnameyan ji endamên Partî, komele, rêxistin, û koman pir kêm bû, ew jî ji ber metirsiya wê hebû, û ew kesê ku ew nasname pê re bihata dîtin yekser ji hêla rejîmê ve cihê wî zindan bû, lê ji hêla me fqîrên xwedê, me digot ev kesayetek pir bi şan e.

Niha û stara xwedê li me be, kesek ji me nemaye ku du sê nasname di berîka wî de tune be, bixwe ew çandeke rêxistinî ye, û pêwîst e ku sazî û rêxistinên heyî, û li ser karê xwe endamên wan xwedî nasname bin.

Lê di vê qerebalixê de, êdî hema ° kes digihên hev, çi nivîskar, siyasetmedar, ciwan, goştfiroş, nanfiroş, û «Yanesîb Firoş», gava yekem ji pirojeya wan derxistina nasnameyê ye, yekser berê xwe didin dîzaynerê ku çêkirina nasnameyan ji wan re bûye jêderke fermî ku ew abûra xwe û malbata xwe bikin. Rojane navendên dîzayneran tije xort, keç, kal, piçûk, hemû jî ji derxistina nasancyan li wir in!

Vêca wek me di destpêkê de got ku ew nasname bi gelek zimanan tên nivîsandin û yên sereke «Kurdî, Erebî, Ingilîzî» ne, Kilîşê nasnameyan jî her yek ji wan radihêje logoyê wê saziyê ku tiştek ji vê diniyayê nema ye û ewan tevlî logoya xwe nekirine, çi pênûs, kullî, kêzka hecê, çaydan, mêzên, û papor. Û piraniya dîzayneran bi her sê zimanan jî nizanin, loma her ku mirov nasnaeyekî dibîne, ku ew ji şaşîtiyê ziman ne bê par e û bi taybet zimanê dayikê, ez qurban bim yadê..!

Vêce xwediyê wê nasnameyê, û bi taybet yên nivîs(kar) wêneyê xwe yê herî fotoşopkirî ji nasnameya xwe re dipijirîne, û du-sê carên dî jî dide ber firçeya fotoşopê, ta riwê xwe yê … spî bike.

nasname dibe perçeyek ji berîka wî, wek guleya tifingê di berîkê de amade ye, hema ku li ku jê were xewstin yan neyê xwestin ew derdixe. Li ser gelek riyan rêbend hene, doza nasnameya danasîna mirov dikin, yekser xwedîyê nasnameya biriqandî mîna şagirtên zîrek ku bawernameya xwe li ba dike, nasnameya xwe derdixe û bi jixwebawcriyck mezin dibe ber çavê kesê li ser wê rêbendê, feqîro ma ew ji ku dizane ev çi nasname ye, dibe ku ew kesê li ser wê rebendê nexwende be jî, radihêje wê nasnameyê ji wî weye ku ev kesê li hember wî kesayetek navdar û naskirî ye, êdî jê re dibêje ser çavan heval fermo bike, ka rê ji heval re vekin.. ji xwe wê demê nema serê hevalê me di pencerê de hîltê..!

Çanda van nasnameyan bûye cihê tevlîheviyê li gelek cihan, ji aliyê ziman ve ew şaşîtiyê mezin ve berbatkirî ye, û ji aliyê ku her kes dikare ji xwe re yan ji rêxistina xwe re nasnameyan derxe ew bixwe cihê metirsiya herî mezin e. «Helbet di warê ewlehî de»..

Em vê mijarê davêjin li ser maseya Rêvebiriya Xweser û Desteyên Rêvebiriyê ku li hember vê çandê bisekinin, ji ber ku bûye modîla salê..!

Li Amedê Dîsa Şer, Pevçûn û Êrîşan Destpê Kirin

Şer û pevçûnên li Sûrê yên ku duh bi şev ve hinekî sekinîbûn, îro piştî nîvro dîsa dest pê kir û herku diçe girantir dibe.

Li Sûrê îro jî li qada mizgefta Kurşunlu tîmên taybet 5 kes birîndar kirin.

Dihayê ragihand ku li navçeya Sûrê ya Amedê êrişên polês û tîmên taybet herî zêde li qada mizgefta Kurşunluyê zêdetir dibin. Tîmên taybet bi guleyên bombeavêjê ve ji heman malbatê 4 kes birîndar kirin.

Li aliyê din tîmên taybet li qada mizgefta Kurşunluyê welatiyekî din jî birîndar kirin. Kesên hatin birîndarkirin ji aliyê niştecihên taxê ve tên dermankirin.

13: 15 —Li Sûrê qedexe berdewam dike

Li hin taxên Suriçiyê her çiqas qedexeya derketina derve tunebe jî ji ber ku li van taxan bi şev qedexeya fîilî heye, gelê Suriçiyê bi roj derdikeve pêdiviyên xwe yên rojane temîn dike. Tek Kapi ya ku duh hatibû girtin îro vebû û gel têre ji Suriçiyê derket û kete Suriçiyê.

Bi Stranên Xwe.. Her Du Bira Agir Bi Dika Şanoya Navenda Mihemed Şêxo Dixin

Di roja Sêşembê 15 meha Çileya Pêşîn/ Dîsember 2015an û bi serpiriştiya Navenda Mihemed şêxo a çand û hunerê li bajarê Qamişlo, ahengek hunerî ji bo hunermend Mehmûd Ezîz Şakir û birayê wî yê mûzikjenê navdar Mihemed Elî şakir û bi amadebûnek mezin ji xelkê Qamişlo lidar ket.

Di destpêkê de û berî ku perdeya dika şanoyê were hildan rêvebirê ahengê mamoste bixêrhatina hemû beşdaran kir û bi xuleyeke bêdeng li ser giyanê şehîdên Kurd û Kurdistanê kesên amadekar rawestyan, dûv re kurtejiyana hunermend Mehmûd Ezîz Şakir bi zimanê Erebî hate xwendin, û li gor xwesteka rêvebirê ahengê û bi çepk û lîlandinan mêvan û cenaweran perdeya dikê hate hildan, û bi strana « Bînin Vê Bûkê Bînin» tîma mûzikê bi serkêşiya Hunermend Mehmûd Ezîz li ser dikê diyar bûn.

Careke dî, û bi awayekî fermî, bixêrhatina Mehmûd Ezîz hate kirin û mamoste Bêrîvan Xalid Seroka Desteya Çandê hate vexwendin li ser dike û gotineke kurt derheqê huner û hunermendan got. Tiştê herî balkêş ku Bêrîvan Xalid amaje pê kir ku miletê me nizane di saxiya hunermendên xwe de li wan xwedî derkevin, tenê çaxa ku hunermendên me diçin ber dilovaniya xwedê em ji nû ve ji wan re şevbuhêrka lidar dixin, lewre em îro wek Desteya Çandê û bi sebareta vê ahengê em xelata Desteyê diyarî hunermendê mezin Mehmûd Elî Şakir Dikin.

Hunermend Şakir xelata xwe ji dest Wezîra çandê wergirt û spasiya wê û vê xelatê kir û got:» Bi saya pakrewanên me em îro ahangan lidar dixin û strana dihûnin, û çepk û lîlandinan jî dikin, pir ji bo amadebûna we spasdar im, ku em vê şevê bi hev re derbas dikin, û spasiya tîma mûzîkê dikim ku ev çend rojan di biroveyan de bi min re kar dikin». Paşê hunermend dest bi stranan kir, û ji wan jî: Rêwîyo, Were Were Gulîzarê, Emam Dilo, Hey Lêlê Hinnê. û berî ev aheng bidawî bibe, hunermend Mehmûd Eziz bi du strananên xweş di ahengê de beşdar bû û silavên xwe di riya ragihandinê re ji hemû amadekar û guhdaran re şand. Ji hêla xwe ve rojnameya Bûyerpress hevpeyvînek taybet bi hunermend Mehmûd Ezîz Şakir re kir, ku wê di hejmara sersalê de bê weşandin.

Şepêla Pêşeroja Kurdî Li Sûriyê Semînerekê Lidar Dixe

Parêzerê Kurd Ristam El – Temo Serokê Navenda Navçîbûnê ya ku bi Hevbenda Parêzerên Azad ve girêdayî ye, di roja Şemiyê de 13 meha Çileya Pêşîn/ Sebtember, saet 3ê piştî nîvro û bi amadebûna birrek ji nivîskar, rewşenbîr û mafnasan semînerek li Qamişlo, li nivîsgeha Şehîd Mişe'l El – Temo a Şepêla Pêşeroja Kurdî Li Sûriyê lidar xist.

Herweha endamên nivîsgeha têkiliyan ên Şepêla Pêşeroj a Kurdî Li Sûriyê, û hejmarek ji çalakvanan jî amade bûn.

El – Temo di semînara xwe de ya derbarê Navçîbûna Navdewletî de li ser asoyên Navçîbûna Navdewletî û pêrabûnên gerek di dema navçîbûna pirsgirêkekê de axivî.

Û piştî ku semîner bidawî bû, deriyê pirsan hate vekirin, û amadekaran semîner bi pirsên xwe dewlemend kirin. Herweha kesên ku bi karê vê semînerê rabûbûn, kesên amadekar spas kirin.

Serokê Emerîkayê Barak Obama bi wêneyên cuda derdikeve holê ku ew wêne gelek nehatine weşandin û hinek ji wan wêneyan yên girêdayî malbata wî û jiyan û peywendiyên wî ne.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelali

Ger Siyaset Biqede Em ê Li Ser Çi Biaxivin?!

Dixwin

Nan û siyaset, şekir û siyaset, mazot û siyaset, kehrebe û siyaset, koçberî û siyaset, û siyaset û siyaset…HTD Li tax û kolanên Kurdan ti cudahî di navbera siyaset û jiyana raojane de tune bû, ev diyarde ne nû ye li cem Kurdan, lê geştir bû piştî ku Kurd bûn xwedan hêzeke siyasî û leşkerî, û bûn aliyê herî girîng di kirîza Sûriyayê de. Beriya 2011an, ji ber tirs û serdestiya rêjîma Sûriyayê, Kurd pirr di siyasetê de bi vê eşkeretîyê ne dixebtîn û ne diaxivîn, lê tim rastî wî dihat, ji ber ku siyaset guneheke bi yê Kurd ve bû, ger bixwesta yan na, lê ji 2011an û vir de êdî siyaset bû av û xwarina rojane. Ji ber ti kesî nabîne ku ya di dilê wî de bibêje, yan jî derfeta xwe ji nû ve dîtine da ku ya di dilê xwe de bibêjin, lê heger em bixwazin serjimarekê ji mijarên ku têne gengeşkirin çêkin, gelo wê mijarên ku milet serê xwe pê diêşîne, çi bin?! Helbet mijar pirr nêzîkî hev in, lê helbet ku siyaset ji çi mijarê be, bê par namîne.

Siyasetmedar Çi Li Mijarên Me Zêde Dikin

Siyasetmedarê Kurd heman mijarên siyasî yên milet dibîne, û bi wî çavî lê dinêre, lê hin gotinên mezin û qelew tevlî wan dike, ji ber ku alav û awayên xwe bikar tîne, di vî alî de jî carinan alav û awayên wî normal in bêyî ti taybetmendîyê yan rengê şîrovekerekî siyasî, ji ber ku çanda siyasî bi wê şêweyê pêşketî û akadîmîk ligel wî tune ye. Siyaseta Kurdî, çi ji hêla siyasetmedaran an ji hêla milet ve be du nîşanên wê hene, ango du armancên wê hene, ji ber ku du çavî ne di heman berçavkê de. Ya rast ew e ku veqetandineke xuya û diyar di navbera asta siyasî û milet de, hebe. Nemaze ji aliyê şîrovekirina bûyeran ve. Ji destpêka tevger û serhildana Sûriyayê diyar bû ku nêrîneke kûr û dûr li pêşiya çavên siyasetmedarên Kurd tune ye, wan jî bûyerên ku li Sûriyayê diqewimîn bi heman nêrînên serhildêran didîtin. Siyaset, Heta Kengî Facebook ji wan alavên herî tên bikaranîn ji bo nêrînan, çi çewt û kelegermî bin yan rast û giran bin, di vê de jî siyasetmedar û milet, heman mijaran gengeşe dikin û bi heman berçavkê lê dinêrin. Rewşeke mîna ku devera me tê re derbas dibe ligel zehmetiyên jiyanê ji hêla abûrî û ewlehî ve nahêle ku her kes bi tiştên xwe tenê mijûl be, jixwe ev tişt şaş jî be wê bidome. Hin Bi Siyasetê Nanê Xwe

Jixwe me got ku siyaset nanê rojan e di kolan û civat û civînan de, lê carinan dibe jêdera jiyana hindek kesan. Beriya 2011an siyaset mîna pizotê bû, yê ku tê de kar bikira helbet wê pê bişewitîya, û qelenê wê jî pirr giran bû, lê di dema aniha de siyaset bûye mîna benîştê devan, her kes dicû, û her kes diavêje. Girêka Kor a Siyaseta Kurdî Siyaseta Kurdî mîna giloka ta ye lihevgelicî ye, û hemû bi girêkên kor ve hatine girêdan, lewma tu rengê wê tune ye, û dîmenên wê nexuyane, tenê berhemên wê yên tevlihev xuya dikin. Siyaseta Kurdî li Rojavayê Kurdistanê pirr hêsan e ku tu tevlî bibî, û di barî wê de biaxivî, lê ya zehmet ew e ku tu berheman bidî, mîna dareke têr pel û şax, lê bê berhem û ber.

Çima Kurdistan Nabe Dewlet?!.

Di mejî û ramanên her Kurdekî de ev pirsa herî giring bê bersiv dimîne: Çima Kurdistan nabe dewlet? Tevlî hebûna hemû xwestekên avakirina welatekî serbixwe, mîna: Xak, gel, ziman, samanên siruştî .....hwd. Lê miletê Kurd pê par maye ji mafên mirovatiyê, ew jî ji ber tunebûna welatekî ku bibe cî û war ji her Kurdekî re li tevaya cîhanê, lê mixabin ev welatê ku di çirok, stiran, cejn û şevbuhêrkan de navê wê dihate gotin, tenê li ser nexşeya dîrokê de maye xewna Kurdan. Başûrê Sûdanê ji welatê Sûdanê hat veqetandin û weke welatekî serbixwe hat ragihandin di nava welatên cîhanê de û di Netewên yekbûyî de wek endam hate zanîn. çima başûrê Sûdanê tevlî xizanî û lawaziyê bû dewlet ?!. Çavdêrên siyasî derbarê serxwebûna Başûrê Sûdanê de dibêjin, ku sedema sereke di serxwebûna vî welatî de ew bû, ku her kesek ji miletê Başûr, mêr, jin, kal, zarok bi tavayî vîna serxwebûna welat li cem wan hebû, ji alîkî din ve, siyasetmedarên Başûrê Sûdanê karîbûn danpêdanekê ji hemû welatên cîhanê û bi taybetî danpêdana wlatên derdora başûr qezenc bikin. Sebaretî avakirina dewleteke Kurdî ku maye xwenek di mejiyê siyasetmedarên Kurdan de, herweha di mejiyê her Kurdekî de li tevayî cîhanê, em dikarin bêjin ku Kurdistan ji her welatekî ji welatên cîhanê bêtir amade ye ku bibe welatekî serbixwe û azad, lê dimîne sedemên sereke ku ta niha tevgera siyasî û serok û berpirsên Kurdan li her çar parçên Kurdistanê, nikarîbûn danpêdaneke navnetewî ji doza Kurdî re bistînin. Vîna serxwebûnê li cem miletê Kurd heye, herweha Kurdistan welatekî zengîn e, di samanên siruştî û ne siruştî de, tenê dimîne yek rêzî û vîneke rast û dirust nemaze ku ji cîhanê re bi tavayî hate xuyanîkirin ku Kurd miletekî aştîxwaze û di cengan de şervanekî qehreman û leheng e, herweha miletê Kurd hatiye naskirin li ser asta tevaya cîhanê ku ew miletekî mamnavendî ye û dûrî hêzên terotîst û radîkal e, nemaze di misilmantiya xwe de û ev jî dibe yek ji sedemên giring ku welatên cîhanê piştevaniya vîna miltê Kurd bike di avakirina welatekî serbixwe û azad. Eger em vegerin sedemên serxwebûna Başûrê Sûdanê herweha û berûvajî wê herêma Kurdistanê ta niha nikare biryara serxwebûnê bistîne, çend xalên sereke hene ku alîkar bûn bi serxwebûna başûrê Sûdanê re: 1- Gelê Başûrê Sûdanê bi tevayî cudabûna ji Sûdana Bakur dixwestin (serxwebûna Başûr). Lê Kurdan li herêma Kurdistanê rêveberiyeke xweser dixwestin. 2- Gelê Başûrê Sûdanê bi vîneke xurt û bi erêkirina rêjîma Umer El-Beşîr serxwebûna Başûr dixwestin. Lê gelê Kurd li herêma Kurdistanê xwesteka serxwebûnê li cem wan hebû lê dûrî erêkirina rêjîma Be`sa Iraqê bû. 3- Xwesteka serxwebûnê li cem gelê Başûrê Sûdanê hebû li gel piştgiriyeke herêmî û navdewletî. Lê li herêma Kurdistanê ev helwest lawaz bû, tenê xwesteka avakirina rêveberiyeke xweser li hindek deverên herêma Kurdistanê hebû ew jî dibin metirsiyeke herêmî de ku dewleta Iraqê parçe bibe herweha gefên curbecur ji rêjîmên herêmî re. 4- Gelê Başûrê Sûdanê û siyasetmedarên wan gelek mifa û sûd wergirtin ji pirsgirêk û aloziyên di navbera Umer El - Beşîr serokê Sûdanê û civaka navnetewî de. Lê bi darvekirina Sedam Hisên û nemabûna wî li jiyanê ev derfeta zêrîn ji destê Kurdan hate wendakirin. Ji aliyekî din ve Başûrê Sûdanê li dirêjahiya dîrokê de, cografiyeke taybet jê re tune bû, lê herêma Kurdistanê di dîrokê de hatiye naskirin bi nav û cografiya wê ya taybet. Di warê ziman û al û sirûda netewî de, Başûrê Sûdanê piştî serxwebûnê zimanê Ingilîzî ji xwe re hilbijart di şûna zimanê erebî de, herweha ji nû ve sirûd û aleyek niştimanî ji Başûr re nîgar kirin. Lê sebaretî herêma Kurdistanê, ji berxwedanê, lehengiyê û welatparêziya bê hempa ya nehatiye rawestandin ji sedê salan tanî roja îro ku gelê Kurd gihaye vê qûnxa pir buha ku bîna aştiyê, azadiyê, serxwebûnê ji xaka Kurdistanê ya pîroz tê îro di vê demê de gelê Kurd di hemû wextî bêtir nêzî azdî û mafê xwe ye bi tabet di Rojavayê Kurdistanê de ji ber tû kesî wekî Kurdan fêde ji tevliheviya Sûrî nekirin, lewra zû bi zû ketin liv û tevgerê bi zanebûn bi rêxistin saziyê xwe ava kirin, lê herî balkêş dameziranda hêza YPG ê bû ku her kes dizanin ku ne jê baya kesî nizanîbû wê halê me û deverê Kurdî çi baya, ev hêza ji dilê civak a gelê Kurd hat avakirin roj bi roj mezin bû bi tevlêbûna ciwanên dilpak ûhêja ku ana bûye hêza yekemîn li seranserê Sûryayê, ev hêza ku karîbû parastina seranserê Rojava bike, ji sînorê Başûrê Kurdistanê tanî bi çiyayê Kurdan ta kû her kes gihişte bahweriyekê ku yê pişta tîrolîstan şikandin ev hêza Kurdan bû, yê xak rizgarkirin dîsa Kurd bûn, ne ji wan bûna ana kevnariya dîrokê de miletê Kurd xwedî ziman û zaraveye û al û sirûda netewî ji dema damezrandina Komara Mehabadê di sala 1946 de heye. Dimîne xala herî balkêş, ku avakirina welatan pê ve girêdayî ye û şerê cîhanî jibo wê çêdibin, Zeviyên neftê ango patrol. Pırsgirêka berhem hênan û firotina patrolê li Başûrê Sûdanê heye,çimkî rê û benderên henardin ango tesdîra patrolê li Bakurê Sûdanê dimînin ew jî bi sedema avrêjkirina zemînê ji Başûr ber bi Bakurê Sûdanê ve diçe û patrol bê pamp ji Başûr ber bi Bakur ve dimeşe, ev jî dibe sedemekî sereke ku hikûmeta bBaşûr boriyên patrolê veneguhêze nav xaka Başûr. Li Herêma Kurdistanê ev pirsgirêk tunene, çimkî patrola herêmê û ya Iraqê bi giştî di nav xaka Herêma Kurdistanê ve diçe bendera Cîhan li Turkiyê û di paşerojê de eger Kurdistan serxwebûna xwe bistîne, astengiyên berhemhênan û henardina patrolê wê tune bin. Di encamê de em dikarin bibêjin ku tu pirsgirêkên mezin ji alî samanên xuristî û cografî û ziman û al û artêş û hemû xwestekên avakirina dewleteke Kurdî tune ne, tenê dimîne rêveberiyeke zanist û diplomasiyeke navnetewî ji alî siyasetmedarên Kurd ve ku danpêdaneke navnetewî ji serxwebûna Kurdistanê re bistînin. Di dawiyê de pirsa li pêş hate kirin dûbare dibe û li ser maseya siyasetmedarên Kurd tê danîn: Çima Kurdistan nabe dewlet? Jêder:»Dewlet di navbera Kurdistanê û Başûrê Sûdanê de(Ehmed Elzawîtî) yê wekî Daişê û Nusra wê di herêm de bana.

Geleka jî ev yek dixwestin pir pê kêfxweş dibûn, lê bi berxwedana keç û xortên me xaka pîroz bi bedena xwe xelat kirin bi xwîna xwe av dan, nehiştin kiryarên wan kevneperestan biçin serî. Bela ew di wê baweriyê de bin ku ev destkevtiyên gelê Kurd ku bixwîn û xwêdana van pakrewanên giranbûha ketin destê me de wê tu kes nikaribe nêzîkî wan bibe ew destê dirêjî xak û mafê gelê me bibe wê bê jêkirin wê qetqetî bibe.

Destê Dirêjî Xaka me Bibe Wê Bê Jêkirin

Îro di vê dema dîrokî de, di ev dama zêrîn ya ku li ser mesefeke zêrîn bi gûlê azadiyê hatiye xemilandin bîna wê li pozê hemû welatparêzan û leşkerê doza gelê Kurdan dixîne, îro bi serbilindahî û fidekearî keç û xortên Kurdan canê xwe bê bedêl bê hesab gorî axa Kurdistan pîroz dikin, ne li Rojavayê Kurdistanê bi tenê lê li her çar perçê Kurdistanê jî. Bakûr, Başûr,Rojhilat, Rojava, ya ku ana bûye sembûla berxwedana Cîhanê, kû hemû xelkê Cihanê dan zanîn ku îro yê ku pirsgirêka Rojhelata Navîn bi wan çareser dibe Kurd in. Yê ku dikarin xwe û hemî gelên deverên Kurdî bi tevahî biparêzin. Yê ku li ser erdê roleke mezin bilîzin Kurdin, bê hevkariya wan tu çareserî nabe. Ji ber vê yekê em bi çavê xwe dibînin bi guhê xwe dibhîzin bê çi tê gotin çi jî dibe, bi taybet di çareserkirina kirîza Sûryê de ku ev serê zêdî çar salan gelê Sûryê wekî fetbolê li ber lingan çûye, ji ber alozya dibendî ku di nav dewletê alîgirê rejîmê wekî (Rusya, çînê, îranê..) û alîgerê opozisyonê wekî (Emerîka, Ferensa, Birîtanya) heta bi dewletî erebî jî dibendî ne. Çimkî her kes li gorî bercewendiyên xwe kar dike û benik bi alî xwe de dikeşîne her yek dixwaze cihê nigê xwe tê de bi cî bike.

Ji lûma hetanî ana tû çare jê re nehatiyê dîtin. Lê divê ev kesana zanibin ku pirsgirêka Sûriyê bi xelkê wê çareser dibe. Bi alîkariya kesên di êş yên xêrxwaz yê ku li gorî bercewendiyê hemû pêkhatiyê sûriyê xebat û lêkolîna dikin. Ne ew kesên wekî guran li bendî kelaxekî mirî be da perçakî jê birevîne gelê sûriyê bi tevahî jê bê par bimêne. biştî van êş û azarên giran vê xerabûna mezin evqas kûştî, birîndar, penaber , ma qey nebese gelî siyastmedarên hemû cihanê yan hûn dixwazin hîn jî ev xirecir berdewam bike ji bo ev kesê mane jî li ber niga biçin. ji ber gava merov bixwaze çarakê bibîne dive bi hişmendî merov nêzîk bibe cûdayê nexe nav gelê sûriyê de. Her kesî qebûl bike dan û stendinan pê re bike mafê tu kesî nexwe. Ji ber gava şorş li dar dikevin tên ku wan sîstemên şofînî yên li dijî mirovahyê û kesayetyê bigûhere, li dijî wan bisekine ne ku yên xwe bikin xwedyê şoreşe ji rêcîmê şofînî xerabtir bike ev yek ji sedemê ku heta ana pirsgirêka sûriyayê çareser nebû ye, çimkî şoreş guhertina bingehiya fikir û ramanana gûhertin wê mejiyê zingergirtî ye ji ber vê yekê dive her kesê xwe şoreşger bibîne sîstema xwe jî serî hetanî binî bigûhêre, ma çêdibe ku mirov şoreşgêr be di heman demê de jî dictator be….!? Gava şoreş lidar dikevin gûhertinên pir mezin bi xwe re tînin. Ji ber vê yekê em wekî netewa Kurd ku bi hezarê salan tê perçiqandin, tûnekirin, hemû rengê tundiyê li ser tê meşandin recîmê desthilate dar bi hemû awayî doz û xwesteka Kurdan tûndikirin heta bi axevtina zimanê wî lê qedexe dikirin gelek zilm û zordarî êşkence li ser didan meşandin da gelê Kûrd xaka xwe berde deverê Kurdî bi xwe bihêle kesên di netewên xwe tê de bi cî bikin bi derbasbûn meh û salan re dimografiya deverên Kurdî bê gûhertin êdî xêr û bêra welatê me pê bimîne. Lê gelê Kurd bi ser lîstokn wan vebûne bi fidekarî xak, çand, ziman û filûklorê xwe parast tev li hemî astengiyên dijwar, girtin, lêdan, kûştin tev li wiha jî gelê Kurd ji ser doza xwe venegerya rêça ku Seyed Riza, Qazî Mihemed, Berzanî û Ocelan dabûne ser can û bedena xwe jê re kirin diyarî. Ew rê şopandin gelek qurbanî di rêça serfirazî û azadiya Kurdistanê de kirin gorî da gelê Kurd wekî hemî gelê cîhanê bijî. Ev incamê di vê demê de tên bi destxistin ji wê

Xoşnav Têlo Ji Bûyrpress Re: Hosteya Jiyana Min «Tembûr» e

Ez ê ji keça «Kurdî» a şervan re bistrêm, ew taca serê min e, çi «YPJ»ê be yan «Pêşmerge» be, ew tiştekî ciyawaz e.

Hevpeyvîn:Qadir Egîd

- Xoşnav Têllo dûrî huneriyê..Siyasetê..Kî ye?

Mirovek im ji mirovahiyê û jiyanê hez dikim, têgihiştina min ji mirovahiyê re cuda ye, asoyên wê fireh in, kêşe û berxwedana mirov di jiyanê de li gel min xalên herî girin in, hewl didim ku di jiyana xwe de piraktîk bim.. Dûrî siyaset û hunerê ez bîr û baweriyên xwe, navê xwe wek mirov di warê jiyana xwe ya rojane de wergerînim. Nasnameya herî giring di jiyana min de ya hunerî ye, ez bav im, hez dikim, carnan aciz dibim, carnan jî aram im, her dem hewl didim hawîrdora xwe fam bikim, xwe bixim kirasê hawirdorê de. Kurek min bi navê Siwar «27» sal heye, ji hêla hunerê de, behremendiya mûzîkê li gel heye, li Gîtarê dixe, strana dinîvîse, lê şêwazê min û wî ji hev cuda ne, ew kêfa wî ji «Hard Rok» re tê, guman dikim hindek bandora min li ser heye, min pir hewl daye ez wî fêrî hezkirina mirovan bikim.

Hunermend Xoşnav bersivê bi kenê xwe yê nazik berdewam dike û dibêje: Ta niha ku behsa min dikin dibêjin ku tu gelekî ji xwe ewle yî «Mexrûr»e, lê bi rastî ne wisa ye.

Ji bo nasînê jî ez jidaykbûna meha heyştan ji sala 1964an im.

- Kî gotinê stranên te bêtir datîne, tu ji kîjan helbestvanî re bêtir distrê?

Eger merov li her sê Elbomê min yên bi awayekî fermî ta niha belav bûne (Karwan, Mîna Xewn, Gazin) guhdar bike, merov bibîne ku tenê 4 stran ji wan ne yê min in, lê yê dî hemû yê min in.. bi rastî gelek helbest û gotin ji min re tên pêşkêşkirin, lê ez ne hemûyan erê dikim, ya ku dikeve serê min de hildibjêrim, bi awaz dikim û didim hunermendin dî, min stranên hin hunermend mîna Se'îd Yûsif, Mehmûd Elî Şakir, û hin stranin filiklorî jî strane.. Min du helbestên helbestvanê gewre Cegerxwîn bi awaz kirine û xwendine.

- Te zû dest bi karanîna amêrên mûzîkî kir, kî di malbatê de hunermed hebû ku nav di te de da?

Min nedîtiye, lê dibêjin ku bavê min tembûrvanekî baş bû, ji ber dema wî koç kir ez gelekî gênc bûm, û yê pişta min girt malbat bû, bi taybet birayê min yê mezin, amêra « Ûdê « ya pêşî ku ji min re hat kirîn, ez heft-heşt salî bûm, û min gelek caran behsa vê meselê kiriye jî ku « Ûd « ji min mezintir bû, lê bi gîştî malbatê hemû hana di min de didan, tev ku di wê demê de, berî çel salî, rewş û meselên hunerî ne wek niha bû, di nav civakê de nedihat qebûlkirin, lê bawer dikim em malbatek hindekî ciyawaz bûn, pastek ji rewşenbîriyê di malbatê de hebû, xwehên min piştgiriya min baş kirin.

- Amêra mûzîkî yê herî nêzîk li ber dilê te çi ye?.

Hosta jiyana min «Tembûr « e, destpêka min bi Ûdê bû, dûv re min Gîtar aniye, wê demê - berî ku Org were jiyana me ya hunerî - Ukurdyon jî hebû, lê di temenê 14 salî de min dest avêtiye Tembûrê, heya ez li Sûrî bûm jî min li «Bizqê» dida, lê piştî wê min hest kir ku tembûr ji giyanê min nêziktir e.

- Xoşnav Têlo li Ewrupayê di warê hunerî de fêrî çi bû?

Ez li wir fêrî şêwaza Konsêrtê bûm, bi sedan mirov li holê rûniştîbin, eger tu derziyekê bavêje dengê wê dihat te, tev ku gelekan ji min fam nedikirin lê rêzgirtinek wê hebû, cemaweran niqaş bi te re dikir, pirs dikirin, guhdanek mezin hebû. Piştre ez derketim Ewrupa Rojava, Siwêd û Elmanya, weke xwendevan ez havînî diçûm Berlîna Rojava, min kar dikir ta karibim jiyana xwe ya aborî biqedînim, ji ber di wê demê de xwendevanekî rewş tenik bûm, li wê derê min li Bar û Xwaringehan stran digotin, lê derba herî mezin ku min li wir, li Siwêd û Elmanya dît, em diçûn Konsêrtan, û cemawerên me 99% Kurd bûn, û hemû nedihatin ji bo guhdarkirinê, tenê dihatin bo kêf û govendê. Bi rastî cudahiyek mezin bû, bi taybet ku li Polonya pênc stranê min di radyoya dewletê ya fermî de tomarkirî bûn. Demekê baş min bi vê rewşê re berdewam kir, lê dawî min hest kir ku ji giyanê min dûr e, min nas kir ku şêwaza Konsêrtên Kurdî dûrî guhdankirinê ye, nemaze ku di yek şevê de şeş – heft dengbêj amade bin, her yek bi şêweyeke wî taybet heye, bi rastî piştî demekê ez ji vê yekê westyam û min xwe dûr xist, tenê eger Konsêrtek taybet yan pirogramek heba ez diçûm, ji xwe şevê xêrxwaziyê ez her dem li wan, bi hunera xwe amade bûm, bawer bikin eger ez çûbim sed şevî, wê heyştê ji wan alîkarî be.

- Çi taybetmendiya strana te ya bi navê « Leylo « heye? Çîroka wê çi ye?

«kenekî kûr berdide» tev ku ev stran neketiye tu Elbomên min yên fermî, lê bêrîkirinek guhdarên min ji strana «Leylo « re heye, lê du - sê kasêtin şevbuhêrk û rûniştinan hene min di wan de gotiye, berê awayên têkiliyê gelekî kêm bûn, û min gelekî bêriya mal dikir, û ta niha jî ez bêriya welatê xwe dikim, lewre di wê demê de min kasêtin taybet tomar dikirin û ji diya xwe re dişandin, him name bûn û him stran bûn jî, hindek ji wan kasêtan di riya kincên malbatên re yên nifşê didwa hatin belavkirin, û yek ji wan jî strana ku tu behs dikî « Leylo « yî. Bawer bike tev ku gotin jî yê min bûn, nema tên bîra min..!

- Tu li Hunera Erebî ya resen guhdar dikî.. kî ji wan?

Di destpêkê de ez hîn nifşê radyo me, yê hînbûna di riya guh re, di malê de me , guhdariya mûzîka Erebî ya resen dikir, xweşka mezin ji Mihemed Edilwehab hez dikir, hindekan ji Ferîd hez dikir, û ji xwe Feyrûz ya ku wek erkekî ye û bê wê nabe, xweşka min Nesrîn jê hez dikir, ta min ji xwe re nasnameya rengê xwe girt, min guhdariya van hemû hunermendan dikir, ez nêzîkî Ebdilwehab bûm, û dema ez bûm pazdeh salî (Dema evîna pêşî) min Ebdilhelîm Hafiz guhdar dikir, û piştî ez gihiştim hîjde salan, min guhdarî bi awayekî mezin li Um Kelsûm kir, ez gelekî pê ve hatim girêdan, û min piraniya stranê wê jiber kirine, bêtir yên ku hunermend(awazdane) Belîx Hemdî ew jê re awaz kirine, ji ber taybetmendiyek wan li gel min hebû, min di wê demê de gelekî ji helbesta Erebî ya kevin û resen hez dikir û min jiber dikir, mîna helbetsên (El – Mu`elleqat)

- Te behsa evîna xwe ya yekem kir,tu dikarî ji me re li ser - tiştên ku jê têne gotin – biaxivî.

Evîna min ya ku demek dirêj ez pê mijûl bûm, û ku niha tê bîra min carinan ez dikenim jî, û gotina erebî ya « Evîn tenê ji yarê yekem re ye» tê bîra min, evînek xweş bû di wê demê de, û min baş tişt li ser nivîsandine, eger rojekê derfet hebe ez ê belav bikim.

- Rojnameya Bûyer ji bo belavkirina wê amade ye.

Spas dikim..çawa em nifşê Radyo ne herweha evîna me jî ji wî nifşî ye, ji ber di wê demê amêrên têkiliyê wek niha tune bûn, carinan ji sibehê ta êvarê em li serê kolanê radiwestyan, tenê bo çavê min li çavê wê bikeve, me nameyek dinivîsand, sed fen û fût dikirin ta ku ev name digihişt destê wê, di ber re destê me dircifî, em poşman dibûn, min gelek name bi vî awayî gihandin destê wê, lê tu dikarî bibêjî evîna me ji yek alî bû, jî ber ez û wê di yek temenî de bûn, jin zû bi zû digihên vêca di zewac û avakirina malê de difikire, û ê min ez hîn gêncekî di xewn û xeyalan de dijiyam, ew evîna min ya pêşî bû û di asta evîna temîz û paqij de ma.

Di sala 2002an ez hatim serdanekê.. ez pir pir aciz bûm ku min ew nedît, ez wê demê nexweş jî ketim, hatina min tevlihev bû.. serdana duwem gava ez gihiştim Qamişlo, yekser berê min li mala xweşka min bû, ez gihiştim, min çente û xiradê xwe dadixistin, min dît jinek li pêş min sekiniye, got min: Merheba Xoşnav, û destê xwe ber bi min de dirêj kir. Min serê xwe rakir ji min re got: Ez filankesê me..!

Bi rastî di filman de jî wilo nebûye, piştî 31 salê merov hev bibîne... lê mixabin min ew qet nas nekir, em derdora pênc deqeyan bi hev re man, gelekî hatibû guhertin, pêrgîbûnek ecêb bû..!

- Derketina ji welêt ji bo xwendinê bû, tu nabînî ku tu gelekî dereng ma ta te bidawî kir.

xewna min bu ez derhêneriya sînemayê bixwînim, lê ew derfet neket destê min .

Min peymangeha mûzîkî du sal û nîvan xwend, min xwest berdewam bikim û Macistêr bixwînim, lê hindek astengiyê min hebûn, daxwazên ku ji merov tên xwestin ji amadekiriyên me mezintir in, wek nimûne berî ez ji welat derkevim min tenê du caran amûra Piyano min di jiyana xwe de dîtibû, lê li wir ew madak sereke bû, kesên ku ji wir bûn û mûzîka dixwendin, berî niha ji şeşan ta diwazdan mûzîk xwendine, ciwaziyek miezin di navbera me û wan de hebû, lewra min nikarîbû berdewam bikim, herweha min biryar da ku ez xwendinek dî bikim, û min dest bi xwendina «Zanyariyên Siyasî» kir, û di sala 1993an de bidawî kir.

- Guman dikim deh sal derbas bûne û hunermend Xoşnav Têlo çi berhemên nû dernexistine.. ew jî sedem çi ne?

Niha Elbomek heye ji 13 stranan e, min demek dirêj li ser kar kiriye, û wê nêzîk belav jî bibe. Sedema derengketina Elbomên min, ji ber kêşeyek heye ew jî ku hunera kurdî sûkek wê tune ye, yan jî sûkek bê bazar e, wek min ji te re berî niha jî behs kir.

Ji hêleke dî ve, ez di sala 2009an de vegeriyam û min dest bi xwendinê kir, min Dektora di «Zaniyariyên Siyasî « de çêkir, û vê yekê jî demeke gelek dirêj ji min xwar, tev wilo jî min di sala 2009an de Heyşt stran li Tirkiyayê tomar kirin û dixwest wan belav bikim, lê hindek kar ji wan re gerek bû, û hindek kar ji wan re diva, ta mesela xwendinê ber bi hev de hat, ev dîsan derdora sal û du meh in min dest bi wê Elbomê kir û ez hêvîdar im ez tiştekî pirofişnal ji wan re pêşkêş bikim.

- Elboma te ya nû ku ji 13 stranan pêk tê, piraniya stranên wê li ser çi ne û gotin û awazên kê ne.

Rojava gelekî tê de derbas dibe, behsa koçberiya ji Rojava dikim, mîna hawarekê ye, ez dibêjim:

Strana «Dîrok» min li ser Nêt belv kiriye, behsa rewşa Rojava dike ku ketiye nav dorpêçkirinekê de. ez dibêjim:

Rojên teng û derbiderî
rojên raperîn û koçberî
eger felek bi serê we digeriya
berê we tim li şarê min bû
mala me tim mala we bû
ji nan û xwê ji wan roja
sed mixabin li bîra we
hîç nema.. hîç nema

Destpêka 2004an ji Entabê diçûm Başûr, min biryar da ku ez bi Basê herim ta bihna Rojava were min, lê çûna me ket şev de, u dema em gihan rastî Serê Kaniyê tarî bû, Dirbêsiyê, Amûdê ew jî tarî bûn, ez giham nêzîk Qamişlo ew jî tarî bû, di vir de ramana strana» Rojava « destpê kir, min got:

Weyla li min.. weyla li min
Ev rastî ye, yan ev xewn e ez dibînim
Rojava li nav tariya û şevên wê pir dirêj in
Keç û xortên wê li ser riya qefle qefle koç dikin
Weyla li min weyla li min ev ne xewn e ez dibînim
Ev rastî ye, çi rastiyek tale tale bi çavê xwe ez dibnim
Min Elboma xwe kiriye du beş, stranê bi Rojava û rewşa gîştî eleqedar, û eşê dî stranê evînî ne. Stranek dî tê de heye bi navê «Koçberî « ew jî dibêje:

Roêjn reş bi ser me de hatin
Em li dinyayê tev belav bûn
Kes ha ji kesekî tune
Em her yek bi deverek çûn

- Tu dibînî ku ragihandina serbixwe heye, rast e sedemên kêmderketina te li ser Medyaya Kurdî jî ev e, anku hemû yên partiyan e?

Hewldanin serbixwebûnê hene, , em di serdema Nêt û tiknolojiya dijîn, û ta ku tu şopênerê xwe razî bike hindek mercin giran hene divê merov pêk bîne, yek ji wan meselên teknîkî ne ew jî sermyanek baş jê re divê. Em bixwazin nexwazin ta niha ragihandina me heta nuha bi rêxistinin siyasî ve girêdayî ne, ji ber milletekê bê dewlet in, partiyan bi şêweyekî cihê dewletê girtine, û rola dewletê di civak de digre, û ji ber ew xwedya sermyan e ragihandin pê ve hetiye girêdan. Sermyanên kurdî ên serbixwe negihane asta ku ragihandinê birêve bibin

- Çima hunermendê mezin Ehmed Kaya strana te ya bi navê «Karwan» hilbijart û stra?

Piştî derxistina Elboma Karwan bi 10 salan, rehmetiyê hunermend Ehmed Kaya wê çaxê biryar dabû ku stranê Kurdî bibêje, lê piştî ew çû ber dilovaniya Xwedê hevsera wî ji min re behsa van hûrbîniyan kir , ku dema li ahengekê radighîne ku wê strana kurdî bêje, û çawa kesên amade û hevalên wî kevçî û çeqelan diavêjênê, wê demê biryara wî ew bû ku strana Karwan bêje

Piştî Kaya çû ber dilovaniya Xwedê, hevsera wî xwest vê stranê bi awayekî fermî belav bike, û ev yek jî qebûlkirina min jê re pêwist e, ji min re mîna belgeyek fermî hat ta emze bikim, min got ok, ji min re hat gotin ku dixwazin nasnameya Ehmed Kaya ya Kurdî belav bikin, û tu stranên wî ji bilî vê stranê negotiye, eger tu bixwazî astengiyan derxe û nehêle nasnameya Ehmed Kaya ya Kurdî derkeve tu serbest î. Bi rastî ez li ber xwe ketim, piştre ez çûm Stenbolê û min hemû çîrok nas kirin, û çawa hevalên min yên herî nêzîk kelem ji bo hevdîtina min û Kaya derxistibûn.

Piştî wê min nas kir ew emzekirin ne tenê ji bo Elbomê bû, ji xwe ez dixwazim vê jî bînim ziman ku ez ji stranê ne razîbûm, ji ber gelek şaşî yên ziman tê de hene

- Çima ta niha hunermendê kurd nan ji hunera xwe naxwe?

Na, qet naxwe, sedem jî ew e, sûka hunera kurdî tune ye, lewre hunerê me yên kurd ku bi nav û deng in, nan ji hunera xwe nagrin, tenê hunermendê gelêrî ê ku diçe aheng û dawetan nan ji hunera xwe dixwe, ez bi rengekî ne-erênî li ser naxivim ji ber ew jî rengek ji çalakiyên civakê ye, hunermendê ji hunera xwe dijî yê Konsêrta ye û Konsêrt li cem me kurdan tune ye. Hunermendên dî yên navê mezin, ne ji hunera xwe dijîn, yan divê li ser sifriya tevgerek siyasî bijî, yan divê karekî dî di ber hunerê de bike ku tu têkiliyê wî bi hunerê tune ye, ev e rewşa me.. em milletekî bêwelat in

- Têkiliyên te li Ewrupayê bi warê hunera kurdî re anku bi hunermendên kurd re çawa ye?

Piraniya navên naskirî dost û hevalên min ji nêzîk ve ne, û têkiliyên min bi wan re xweş û berdewam in, danûstendin heye.

- Xoşnav Têlo li ser şoreşê straye yan na?

Şoreş ji bo min Rojava ye, wê çi guhertin ji bo milletê min li Sûryayê bibe, wê çi qezenc hebin, hemû stranên min jî te re behsa wan kir girêdayî şoreşê û civaka min in, koçberya ku li Rojava çêdibe, guhertina dimuxrafî, zilma ku xelkê min li derveyî welatê xwe dixwin, ev hemû êşê min in, û hemû ji ne dûrî şoreşê ne. U tevî ku min li ser şoreşê nestraye, lê eger ez bistrêm jî wê şêweyê min ciyawaz be, dûrî şêweyên navtêdan û yekseriyê, ez jê hez nakim, ji semboltiyê hez dikim. Şehîdek dikeve, hunermedek yekser stranekê li ser dibêje, ê min dixwaz êşa hindirê min bimeye, û bi şêweyeke dî bifetiqe, dibe ji bo şehîdekî ez bigrîm, û bê deng jî bimînim, herweha dibe ez straneke evînî jê re bêjim, lê ew şêweya îroj belavbûyî ye dûrî min e.

Hunermendek heye bûyerekê di stranê xwe de bikar tîne ji bo nav û dengê xwe, yan ji bo «Laykat»ê wî zêde bibin.

- Eger tu rojekê stranekê li ser şervanên kurd bistrê wê kî bin.. YPG yan Pêşmerge, yan her du bi hev re, û yan jî tiştekî wilo di serê te de tune ye?

Heye sê- çar meh straneke di serê min de digere, û ez dixwazim li ser keça «Kurdî» a şervan bistrêm, ew taca serê min e, çi «YPJ»ê be yan «Pêşmerge» be, ew tiştekî ciyawaz e, û ez dikarim straneke evînî di warê fedekariyê de jî li ser bêjim. Ev demeke ez hevoka dinivîsim û pê diramim çawa ez karibim van hestan bi awayekî dirust û rasteqîne, dûrî gelêriya hunerî û siloganan binivîsim.. hindek stranên min hene demê dixwin, stranek di vê Elboma min de heye berî neh salan min destpê kir, û berî çend mehan min bidawî kir, strana di vê babetê de divê baş were meyandin.

- Çima Arta hate damezirandin, ramana kê bû?..

Ramana damezirandina Arta jî wê rewşa di strana «Dîrok» de destpê kir(îro şarê min ketiye tayê..we pişta xwe teva dayê) em girupek kesên zarwê Rojava, ku demek dirêj em li derveyî welat in, em diramyan ka em ê çawa karibin alîkariyê ji bo vê dorpêça ku li Rojava dibe bikin, ragihandinek serbixwe di hundirê Rojava de ku nûçeyan bi zelalî û bê layenî ragihîne tunebû, me dît ku pêwist e em dezgehekê ava bikin, mebesta wê ku ev xelkê ji derve bikaribin alîkariya hindir bikin, û pirojeyê herî pêşî Arta FM bû, xala didwa ji pirojeya me civaka sivîl bû, civaka sivîl piştî şoreşê çalak û aktîv bû, lê ezmûneya wê tune bû, me dît wek erkê me ye em çawa karibin alîkariya wê bikin, bi taybet di warê jinê de, û navê wê pêşî ne Arta bû, navê wê « Navenda Sûrî Bo Pêwendî û Hevkarî Li Deverên Kurdî» bû, (المركز السوري للتواصل والتضامن في المناطق الكردية) lê gotina «Sûrî» ji me re astengî çê dikirin, dûv re bû Arta.. lê berî çend mehan , piştî me nas kir ku rewşa Arta aram e û ne hewceyî me ye, weke çêlîka ku baskê wê çê bûn û bi firê ket, me ew ji xwe veqetand ta karibe karê xwe bi tena xwe bi rê ve bibe, û bawer im wê karibe, ji ber karmendên wê westyane û cihê şanaziya me û Rojava tevî ye ku saziyeke ragihendinê wek Arta li vê deverê hebe.. niha me navê rêxistinê bûye «Ava», ew jî ji Rojava û avdanê hatiye.

- Wateya van peyvan li gel Xoşnav Têlo çi ye?

Rojava: Ger ez derbas dibim sînorê wê, çavê min hêsir dikin.

Helbest: romanek di rûpelekê de ye.

- Xoşnav Têloji karê Rêveberiya Xweriya Dimuqrat razî ye?

Li gor temenê Rêveberiyê û nebûna tu ezmûneyan, guman dikim gavin baş davêje, ev cudahî bi taybet ji kesên ku ji derve tên xuya dike, dı nerîna min de ji erkê her welatî ye, ne li ser kevîka kolanê raweste, lêbelê tev Tevgera Kurdî bibe, jê hêsantir tune ye, ku tu li ser kevîkê bî û rexneyan bike, helbet ê kar neke şaş nabe, helbet wê kêmasî hebin, lê bi gîştî gavin erênî hene, divê hemû pêkhatiyên deverê piştgiriya ezmûneya Rêveberiya Xweser bikin.. em di şerê hebûn û tunebûnê de ne, em li Rojava her roj şehîdan datînin, xwezî di vê qonaxa hestyar de hemû partiyên siyasî bi hev re biketana bi siya hikûmeta «Parastina Nîştimanî» û nakokiyên xwe yên bê tam deynin rexekî dî.

Gotina dawî?

Xelkê rojava , li Rojavayê xwe miqate bin, xwedî lê derkevin

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelali

Rojnameya «Bûyerpress» Dosiya Kuştara Malbata Remezanê Kabreş Vedike (3+5).. Bi Çi Gunehî Hatin Qirkirin..?! Kuştara Winda?.

- Hemo hevalê xwe li hewşê bela kirin teva ciyê xwe girtine û tivingê xwe amade kirine li birine ber û li benda ku Hemo ji wan re bêje dest bi kuştinê bikin...

- Lê hinê dî tirsa mala Silo nemaye di dilê wan de û ji xwe re dibêjin ma wehe ye ku mala Silo ji nişkîve ew bi ser me de bigrin bê ku me haj ji xwe hebe û me teva bikujin...

- Dîtina wan dîtî gulle di şebakê re, di derî re wek baranê bi ser serê wan de hatin… Rê û rêbarî li ber wan hatin girtin, nema karin ji cihê xwe rabin…..!

Gupînî ji sopan tê, sope vedimirin, tenî davêje ser çavê maliyan…. Ser çavê wan reş dibe.. Dibe pitepita pîrekan.. gazindê xwe ji Xwedê dikin li ser vê rewşa xerab.. dibêjin yarebî ev çi rewşe, ev çi zivistan e, wele me zivistanê weha nedîtine.. ev karê mirova dema ku dikevin tengiyê, gazindê xwe ji Xwedê dikin; Xwedêyo ev çi ba ye ev çi zivistan e Xwedê ava bike… Yeka dî li cîkê dî dibêje; na wele Xwedê ava neke… ma ev çi hal e û di ber re zarokên piçûk dinixumînine, wan di mehdikan de diteptepîne, lorîka di guhê wan de dibêje, wan dixin xewa şêrîn, xewa tirsê….! Zilamên malê li ber tifkê destê xwe davêjin qotiyên xwe û ji berîka xwe derdixin, û destê xwe li qotiyê xwe dixin, qotiyê dihejînin û hêdîka qotiya sipî vedikin, radihêjin perika ji ser tutinê û perikekê ji nav wan derdixin.. hêdîka zimanê xwe li serê perikê dixin, wê şil dikin û wê şilahiyê bi destê xwe jê dikin û li tutina xwe dinhêrin, darik marikan ji nav tutina xwe dineqînin ew çixara tirsê ye ew mijûlkirine baz dane ji jiyanê. Wek yekî ku xwe bi tiştekî mijûl bike hêdî hêdî çixareya xwe dipêçin û hesiteyê xwe ji berîka xwe derdixin, çixareyên xwe têxin nav lêvê xwe de û hêdîka wek yekê ku diziyê bike çixara xwe vêdixin mizekî ji kurahiya dilê xwe li çixarê dixin, dû di pozê xwe re derdixin, ew dû wek bahozekî xwe li hev dipêçe, û diçe xwe bi zikê xênî ve digre, ew jî ji xwe re li dûyê çixara xwe dimeyizînin û dikevin xewnên kur xewnên tirsê yên bê binî….

Ewir ji hev bela dibin, roj derdikeve, diniya vedibe, bihna mirovan tê ber wan wek avek gerim bi ser canê wan de tê û şehdebûna xwe tînin.. her yek di dilê xwe de dibêje yarebî vê carê jî diniya vebû û me rûyê ezmên dît... Remezan pişta xwe daye dîwêr û berê wî li Başûr e, ji xwe re dipûnije tizbiya wî ya qoq di destê wî de ye, şeqeşeqa wan diçe li ezmanê hefta disekine û dengê tizbiya qoq tevlî dengê belediya dibe û roniyê li erdê çê dikin...

Çavê Remezan zîq li hewşê ye... Tîne bîra xwe çawa ew li hemû parçê Kurdistanê geriyaye û ketiye astengan de, astengên xerab, birçî maye, serma ditiye, li şikeftan razaye, ketiye kunê keftaran, lê tu carî tirs jê re çê nebûye, ne tirsa dehba û ne jî ya hikumatan… tim wî ha ji xwe hebû lê ev zivistan wî ditirsîne û ew dike û nake nizane tirsa wî ji çi ye… tenê tirseke ne diyar xwe berdaye hinavê wî û heyecanekî şoreşekî di nava wî de çê dike.. û bandora xwe li giyawî kiriye ketiye hestiyê wî ketiye mejiyê wî.. ev bû serê çend rojan ku Remezan ketiye bin bandora tirsa vê zivistanê.. Kesê ku Remezan dîtî hêviya wê mêraniyê jê nedikir, Ji ber ku Remezan mirovekî esmerî, hûrik, û zehîf bû, ew ceger û mêranî hemû di ku de bû kes nizane. Berê gotine:» ne li rengê tûtinê binêr û ne jî li rengê mêran binêre» Remezanê Kabreş van rojan ne li ser hev e, wek yekî tiştekî xwe winda kirbe çiqas dixwze ku jibîr bike lê ew name ji bîra wî naçe, tevlî ku ew bi mêvanên xwe re dikene û dixwe û vedixwe, lê ya wî di dilê wî de ye. Ji xwe dipirse gelo ev çibû ev ji min re ji ku derketin, ma rast e wek ku di namê de danîn wê bikin.. carna ew dikeve di nava heyecanekê de damarê wî li hev dikevin çav li serî sor dibin, mirov dibêje wê niha xwîn di çavê wîr e bavêje. Destê wî dilerizin, nema xwe li ser xwe digre û li ku de be li ciyê xwe dirûne, çavê xwe digre ta ku hişê wî tê serê wî heyecan wî berdidêe bihna wî fere dibe....

Hisên jî li dîwarê Bakur rûniştiye, du balgih li ber pala wî ne û destê xwe daye ber çena xwe, ramanek wî dibê û yek wî tînê. Zaroktiya wî, diya wî, bavê wî, ew perîşanî, tazîbûn, birçîbûn, û bavê wî ew bi çi rezîliyê daye xwendin di wan gundên dûrî şar e ne rê û ne rêbar, ew riyên dirêj di wan berf, baran, û bandevan de.. Wan zivistanên dirêj ew sir û serma, seqem qeşa lîstika li nava gund, nanê ceh, zaroktiya wî tev di ber çavên wî re derbas dibû, weka kasêtekê sînemê... Gund û bajarên Kurdistanê wî û hevalên xwe li hev didan, çol û çiyan, deşt û newal, çiqas bi wan xweş bû xebat, qet ne dikete bîra wan de ku wê rojekê binxet bibin û wê ji Kurdistanê bez bidin.

Hin ji wan ji xwe ditirsin û hinê dî li ser mala Kabreş ditirsin û ji xwe re dibêjin ya me hal e ma ya wan çi hal e.. çima em xwe bixin bela li van feqîran ma ya wan çi ye

Tenê xebat ji bo rêzgarkirina Welatê bindest di bîra wan de bû, ne birçî bûn ne cefa li ber çavên wan nedihat. Ew guftûgoyên Amedê, Wanê, Malitiye, Erzeromê, Mêrdînê, Çiyayê Sipî, Silopiya, Cizîra Bota, û Batiman keda sala îro li şûna xwe hiştin ma gelo rast e, û ka wê bi vî rengî çi bi ser bixin ma welat wisa ava dibin…. Nexasim dema ku ew li Zangoyê bûn, ew qûnaxên pir zor ku di jiyana wî û hevalên wî re derbas bûne, çawa karîn kom û komika çê bikin û berxwedana zindana ji xwe nayê jibîrkirin ew şêweyê eşkencê ku dijminê hov tanî serê wan... ma gelo weheye ku ev hemî belaş here... û ew çiqasî mane di bin çavê Conta Turka de. Ev tişt û bi sedan tiştê weka van hatin ber çavê Hisên û va îro nûneriya vê Partiyê ketiye ser milê wî. Gelo ka wê karibe rahêje vî barî yan na? û va ye ew binxet bûne û berê xwe dane Welatê Demuqrasiyê û mafê mirovan ka wê karibin çi bikin…? Ka wê karibin tiştekî ji bo vî miletê perîşan li Ewropa qizinc bikin yan na? Ka wê kengî ji binxetê herin Ewrop? Ka wê li wir çi bikin? ka wê rewşa milet bimîne çi? Ka wê karibin li Ewropa çi bikin... Hisên û hevalê xwe û bi sedên xorta ji partiya wî û ji partiyên dîtir soz dane û sûnd bi xwîna şehîdan xwarine ku wê kar di ber pirsa kurdî de bikin ta dawiya jiyana xwe ta ku dilopa xwînê di damarê wane hebe.

Her yek ji hevalên Hisên ketiye van xewin û xeyalan. Û lê vegerekê ji xwe re çê dike, lê bê ku hayê kesî ji yê dî hebe û her yek ji hevalê wî ketiye vê rewşa bê dawî...Yê zarokê wî li bîra wî tên, yê ku diya wî, yê bavê wî, yê destgirtiya wî, yê Welat, yê ku havalê wî her yek bi rengekî ji xwe re mijûl dibe lê kes ji wan nizane ku pêşeroja wan wê li gundê Cirnikê bi dawî bibe….!?

Wê rojê hemû di rewşeke xerab re derbas dibin, bêyî ku kes kul û derd û xemê xwe û tirsa xwe ji yê dî re bêje. Her yek ji wan di dilê xwe de dibêje ez ji hevalê xwe re vê tirs û lêvegerê bêjim wê hevalê min ji min re bêjin tu ditirsî yan tu poşman bûyî…!? Ji lewra kes ya dilê xwe ji yê dî re nabêje. Ew di vê rewşa xerab de ne, roj li wan çû ava bihêna wan hate ber wan. Remezan bang kire: Zarokno ka şîvê ji me re bînin beriya mêvan werin. Pîreka şîva wan anî, şîva xwe xwarin, ji xwe re axivîn, ji aş û bajar anîn, careke dî hin cîranên wan hatin şevbuhêrka wan. Remezan got: de ka wan qeremaça bînin em ê xwe mijûl bikin çêtir e em wisa li hev binêrin wê zûtir şev here... Yekî ji mêvanan ji Remezan re got: De ka îşev em qeremaça nalîzin.. Remezan got: nexwe em çi bikin Xwedê ava bike, wele ev şev dawiya wan nayê, wek rojiya filan e, mirov di nav cihan de hişk dibe…!? Yê mêvan got: Ez dibêjim em ê bi gustîlkê bilîzin çêtir e ji qeremaça da ku em tev bilîzin. Qeremaç çar tenê dilîzin lê dema ku em bi gustîlk bilîzin em ê hemû bilîzin. Remezan got: Wele ew jî rast e. De ka nexwe yek gustîlka xwe ji teliya xwe derxê. Yekî gustîlka xwe ji tiliya xwe derxist û avête ji Remezan re… Remezan got: De ka hin xwe bidin vî dîwarî û hin xwe bidin dîwarê dî.. Hin çûne vî rexî rûniştin û hin çûne rexê dî û dest bi lîstika xwe kirin…. Wê yek ji wan bêje bi sopê tu pûç. Wê yê dî bije bi sopê min ji te. Zaro di lîstikê de gerim bûne.. Lê Remezan xemgîn e dilê wî ne rehet e, kurê wî yê mezin Şikrî û yê piçûk Welato îro serê çend rojan ne ne li mal in û tu pêjin ji wan nayê.... Li ku mane, bi ku de çûne behsa wan jî bike, him ji ber mêvanên xwe û him ji ber pîreka xwe, lê agir di hinavê wî dişixule. Welat û Şikrî bê pêjn in. Ebdo li hewşê ye nobedariyê li malê digre. Enwer bê pêjn e, lê ew dizane ku Enwer li Dêrezorê ye û ev ê dî piçûk in, Azad û Xorşîd... diniya li Remezan bûye tara bêjingê riya wî di kevelê wî de nema ye lê li xwe nayne der, Remezan mirovekî bi semax e. Nexasim ji mêvanê xwe fedî dike van babeta veke û li ber wan bêje ka zarokê min li ku man. Rewmwzan weka gewdekî vala li cem mêvanê xwe rûniştiye û bi wan re dilîze û dixwe lê hişê wî ne li cem wa ye... Remezan mirovekî bi semax e, xwe girtiye nexasim li pêşiya mêvanên xwe û di rewşek wisa de. Remezan bi wan re dilîze, dikene, dixwe, radibe, û bi wan re dirûne lê hişê wî ne li cem zarokê wî ye…..! Bist û mêzîn hilkişiyane nîvê ezmên, dîkê nîvê şevê bang da, cîrana da xwe yek li dûv yê dî rabûn çûne malên xwe. Remezan derket hewşê çû ber deriyê hewşê kêlîkê sekinî ta ku cîran ji mala wî çûn dûrketin û di nava wê tariyê de winda bûn, Remezan li ezmane meyizand ezmanekî vale bê dawî lê dagirtî ye ji tiştên veşartî. Remezan keserek kişand û vegeriya hate xênî ji xwe re got: Siphan ji Xwedê re diniya çîk sayî ye, piça ewira li ezmana xuya nake êvarî me digot wê lehî biherikin. Hisên got: De ka em ê razin ka Xwedê çawa çê dike ta sibê ku wisa xweşî bê belkî em karibin ji vir herin cîkî dî. Hevalekî wî got: Hevalê Hisên tiştê Xwedê kiriye betal nabe, dibe ku subî em rabin va berif hatiye.. Êminî li zivistanê nayê bi kêlîka ye carna barane û carna sayî ye.... Her yekî xwe li ser cihê xwe dirêj kir, lê ma xewa kê tê, careke dî ketin xewin û xeyala. Xewnên ji hevketî, yên bê hêvîtiyê, yên tirsê, yên xiyanetê, yên seyr, berûvajî, bê binî û xewnên nîvco. Hêviyên qutbûyî û nexuya. Xewnek wan dide dest yekî, hêviyek wan disipêrê yeka dî, hêviyên bêdawî û bêbinî. Çaxa ku Remezan cara didowa hate odê hîn enterîka odê vêxistî bûn û hemû li ser cihên xwe dirêjkirî bûn, lê kes bi kesî re na- axive, ji wan pirsî ma ez roniyê vemirînim...? Xocê got: Erê wele em ê razin bes e, wa tiştek ji sibehê re nema. Remezan hêdîka destê xwe avête miftê vemirand û vemirandin ode bû tarî, wek gorekê lêhat, derî û şebeke jî girtî ne, heyîv jî çûye ava lê diniya sayî ye. Wê tariyê mêvan birin û anîn her yek di nav cihê xwe de kufkufa wî ye, xwe diqulbîne vî rexî û rexê dî. Şev li wan bû sal, dawiya wê nayê, xewa tirsê ye xilas nabe, giyanê wan li ser doşekê hişk dibe, xwe diqulbêne ser kêlekê ew kêlek hişk dibe, xwe didin ser kêleka dî ew jî hişk dibe, xwe didin ser pişta xwe lê şev bi dawî nabe. Diniya ker e pêjina kesî li gund, li celdê gund, li hewşê nayê. Şevek giran e bê dawî ye; çiqas girane...! Pêjina kesî di nav cihan de nayê, giyanê wan hişk bûye bi doşekê ve maye, yê ku tî dibe jî ranabe avê venaxwe, ji xwe re dibeje tişt nema ku roj hilê ez ji nav cihê xwe dernakevim û tu pêjnê çênakim da ku ez kesî ji hevalê xwe şiyar nakim. Lê halbokî kes newêre ji nav cihê xwe derkeve.. Kes bi halê kesî nizane. Çi şevek giran bi ser wan de girtiye ew xistine nav pencê xwe de....

Li oda pîreka Emîna û bûka xwe û Şikriya û sê zarokê hûr in. Zarokê hûr bê tirs ketin xewa şêrîn tiştek di hiş û mejiya wan de nîne tenê ka wê sibî çi lîstikê ji xwe re bilîzin û wê ew û kî bi hev re bilîzin, ne tirs di bîra wan de ye û ne baran di bîra wan de ye, û ne dijminatî di bîra wan de ye, û ne tiştek ji wan tê xwestin, ketine nav cihê xwe de sero-bino razane hingî bi roj li kolanê Cirnikê di nav wê heriya sora çirde kêferat kirine ji hal ketine êvara kevçî ji devê wan dikeve nema çavê wan ji xewa vedibin ziko-pişto li ser nivîna dikevin, hingî radibin beroşa nîskê li ser agir e, çav neşiştî berê xwe didin legena nîskê û hin savara şeva çû di nav de ye û bi kevçiya dikevin ser de ta çingênî ji binê leganê tê, û bi kolanê Gund dikevin ta melayê nîvro bang dide ji nû ve re li malê xwe vedgerin. U pirê cara nîvrojî nayên malê destê wan ji lîstikê nabê...

Emîna serê xwe danî ser balgihê pirtikî lê ma wê xewa kê were, xwe diqulbînê vî rexî rexê dî nehrê ji ku xewa wê tê pîreke dêye kezeb kere dilê wê li ser zarokên wê ye, du zarokên wê îro serê çend rojan e ku ew ne li mal in, bi ku de çûne li ku mane, ramanek wê dibe yek wê tîne, şev lê giran dibe, pişta wê ji doşekê di êşe, hingî xwe quliband vî rexî û rexê dî lê hedar û seqara wê nehat. Serê xwe rakir li bûka xwe û Şikriya meyizand dî va tu pêjin ji kesî ji wan nayê, ji xwe re got: Xweziya min bi dilê we, çi xewê dikin. Emîna hêdîka da xwe ji nav cihê xwe derket çû eywanê, derî vekir li ezmana meyizand dî wan Komika Sêwiya dageriyaye, sitêrika Kadiza hatiye nîvê ezmên, Bist û Mêzîn hilkişiyane nîvê ezmên... Emîna keserek kişand û derê eywanê hêdîka careke dî girt û guhê xwe da ser oda zilama tu pêjin ji odê nayê ji xwe re got: Xuya dike razane hêdîka bi şûn de vegerya hat kete nav cihê xwe de. Lê dilê wê sê kopalî lê dixe.... Emîna di nava wê tirsê de di xew ve çû, lê nizane çi çaxê şevê ye... Şikriya ew jî di nav cihê xwe de şiyar e, lê xwe bê pêjin kiriye ewê dî ku Emîna ji nav cihê xwe rabû û çû eywanê û li hewşê meyizand lê wê di nav cihê xwe de guhê xwe pêl kirine û her kêlîk ji nişkî ve vediciniqe. Her ku ji nişkîve dihilçene xwe diqulbîne ser kêleka dî carnan li ser kêleka çepê û carnan li ser kêleka rastê carnan li ser piştê, ji xwe re dibêje ev çi şevek ne aseyî ye, û dike û nake xewa wê nayê... Şikriya maye di wê rewşa dirûnî de di navbera razayî û şiyar de ta dîkê sibihê bang daye her ku çavê wê diçûn ser hev dihilçenî careke dî xew ji ser çavê wê diçû, û şev lê vedigeriya weke yê ku şev lê bigere piştî ku wê dengê dîka kir nûka xewê çavê wê girt û bi xew ve çû..... Emîna serê sibê rabû nimêja xwe kir û beroşek nîsk li kuç kir û li ber rûniştî, agir xweş dike.. Lê têr xew nebûye, giyanê wê sisto- pisto ye, dike û nake çavê wê ji ser hev ranabin bawişk li ser bawişkê tênê, li dora xwe dimeyzîne, ji xwe re dibêje baş e kes li dora min nîne wê bêjin min ev tu şevê dî ranezayî, ez ê çi ji wan re bêjim... Emîna serê wê sibihê sê-çar carî çavên xwe şiştiye ta ku xewê xwe ji ser çavê wê berdaye....

Deziyê pêşî ew deziyê zer yê ku roj wan li pêşiya xwe dişîne nîşana hatina wê ye, li ser û çavên Emînê xistin, hişê wê hate serê wê, Emînê bi ser hişê xwe ve hat li nîska xwe meyizand, ji xwe re got: Hîn çend kel jê re divên. Rahişte du-sê qetê tepika kirin bin beroşa xwe de û li ber agirê xwe rûnişt.. Çend Pelên ewra yên ji hevketî li ezman diçin û tên wek marê birîndar, carnan dikevin pêşiya tîrêjê rojê û li ser Emînê dikin sih û careke dî ji nişkîve ew ewir xwe ji pêşiya tîrêjê rojê didin paş rê ji tîrêjê rojê re vedikin û ji wan re dibêjin bihna xwe li me fere bikin. Ew tîrêjên roja çile li ser û çavê Emînê dixin û gerimtir ji yê beriya kêlîkî Emînê desmala xwe li ser û çavên xwe dipêçe û berê xwe ji wan diguhare. Ewir carnan girand dibin xwe berdidin erdê û dibe xumexuma tavan, Emînê agir xweş dike û ji xwe re dibêje nîska min çêbibe beriya ku baranek were. Careke dî ewir hildikişin û winda dibin, tav gerima xwe berdide erdê, hilm ji erdê diçe... Şûn barane serê keçele ji tavê dişewite.

Emînê diçe ber deriyê hewşê derî vedike li celdê gund dimeyzîne. Gundî yê çêlekê xwe ji malê derdixe yê çar bizinê wî hene dane pêşiya xwe û ji mal derdixe. Hin jî diçin tenûrê û teştê hevîr li ser serê wan e û hin ji tenorê tên

teştê nanê gerim li ser serê wan e, hilim ji nanê gerim diçe bêna wî li gund bela dibe. Emînê ji xwe re dibêje bû nîro hîn nîska min li ser agir e ev çi nîskê nekelok in Remezan ji me re anîne wê kengî çê bibin... Roj bejnekî bilin bû nîska wê jî çêbû Emînê rahişte beroşa nîskê bire odê danî. Mêvan jî yeko-yeko ji nav cihê xwe derketin ser û çavê xwe şiştin lê laşê hemyan sisto pisto ye, laşê wan xave ji ber ku kes ji wan şeva çû xweşik ranezaye..... Tev de weke serxweşan e, lê kes bi kesî nizane û kes ji kesî re jî nabêje tiştê ku şevê dî pê re çêbûye, lê çavê wan ji mirov re dibêjin ew şevê dî di rewşek dirûnî serkêş re derbas bûne, tiştê ku bi serê wan de hatî bi serê kesî neyê, her yekî ji wan bi dehê şevpestan dîtine...!? Remezan beriya mêvanên xwe ji xew rabûye û sope ji wan re vêxistiye û çend misînên ava gerim ji wan re danîne ber derê eywanê. Yê radibe dirajê misînek ava gerim diçe dest mêj digre û dest û çavê xwe dişû û tê li ber sopê rûdine.

Emînê beroşa nîskê vala kiriye du-sê leganên mezin de û tûrek nanê tenûrê û çend pîvaz danîne eywanê û bakir Remezan jê re got: Were taştê bibe beriya ku sar bibe. Remezan legenên nîskê kişandin ber mêvanan. Dema ku çavê wan bi nîskê ket yekî ji wan got: Xwedê wekîl e îro roja nîskê ye û rahişte wan seriyê pîvazan her yekî kulmek li wan da, şikandin û ketin ser nîska xwe de..... lê mirovê ku têr nerazabe dilê wî jî naçê xwarinê. Tev bi halê hevin ji pîrek ji zilama.. Şikriya ji oda pîrekan hat oda zilama, ji wan re got: Roj baş hevalno... Tevan lê vegerand: Roj baş hevalê... Vê gotinê guhê Remezan bel kirin ji wan re got: Ev çi ye roj baş... Yekî ji wan jê re got: Apê Remezan hûn dibêjin sebeh alxîr ev bi Erebiyê û ya ku em dibêjin bi kurdî ye.. Remezan got: Xwedê wekala min ne dizanî ez wisa bêjim û ya we ji ya me xweştir e... Hisên lê vegerand ma tiştek ji zimanê dayîka mirov xweştir heye apê Remezan... Şikriya ji wan re got: Xuya dike ev der li we xweş hatiye, jibîr nekin ku em bi çive hatine... xuya dike îro diniya xweş e, diniya vebû ye û baran nayê, ka rabin em debarekî ji xwe re bikin halo ji me re naqede. Zivistan e bê ole dibe ku rojên xweş neyên, heger em li benda rojê wek rojê buharê bin mane xwe em ê li vir bimîn in.... Hisên got: Rast e gotina te ye, mane divê kesek hebe bi me re were rêna şanî me bike, ma hema em ê wilo ji vir derkevin bê ku em zanibin em ê bi ku de herin weke koran...? Xoce got: de ka em taştêya xwe bixwin ka Xwedê çawa çê dike. Şikriya vegera çû oda pîreka wan jî taştêya xwe xwarin ew ewrê li wî ezmanê bilind ew ê belawela xwe li hev dane hev, diniya tarî kirin kirin zilomat û bû xumexuma tavan û şeqeşeqa belediya û pê re pê re baranê dayê û bû firefira bayê reş ser dorê xaniyan radike mûya ji mara dike..baran û ba bi hev re hatin bû bablîsok ew ba û baran li hev dizîvirê dibe bandev çûk li ber wê sirê dihatin birajtin, mar newêrê serê xwe ji qula xwe derxe...

Wê rojê baran nesekinî ta melayê êvarê banga mexrebê daye.... Mêvanan jî xwe li dora sopê dane hev û niçeniça dilopa ye baran ji erd û ezman tê, xaniyê wan dilop dike, hingî wan rojan baran hatiye û av di nav pûş de maye ji lewma çaxê ku dilopa destpê kir hinek cî ji odê dilopa bi şirik dihatin.. Remezan bang kire zaroka ka sênîk û legenan ji min re bînin em deynin ber van dilopan... wele ciyê me li odê nema..nema zaroka di ber dilopan re ne dikin der, hingî xaniyê wan dilop kirin oda mêvanan, eywan, oda pîrekan. Pîrekê wan bûne palê anîna firaxan û vegerandina firaxan. Ev legen tijîbû wê bin birjênin yeka dî deynin cihê wê.. Di ser wê rewşa wan ya dirûnî ya xerab de cî nema lê rûnên ji dilopan ew sênîkê ku dabûn ber dilopan tijî avek sor bûn, çaxê ku dilop dikeve peşkan dipijiqîne, ew peşk li ser û çavê mêvanan dikevin... aveke gemar e, bihnek nexweş bihnekî genî jê tê, dema ku dipijiqe li ser û çavên mêvana dikeve weke çaya beriya sê rojan lêhatiye şûna wê demûş digre û zer dibe..

Remezan ji dînê xwe derdikeve diçe eywanê, dimeyzîne, diçe oda pîrekan dimeyzîne vedigere oda mêvana him fedî dike ji mêvanê xwe ku ev yek bi serê wan de hat û him bihna wîs ya teng.

Simbêlê hina jî wan zer bûne jî dûyê çixara. Simbêl bi xwe dirêj in û devê xwediyê wa simbêla xuya nake..çavê wan dizerwilin neynokê wan dirêj bûne di ber wan de tijî gemar bûye

Piştî baran sekinî bi qederekî Remezan ji kurê xwe ji Ebdo re got: Derkeve ser vî Xwedê xerakirî tenekek dido ka bi xwe re bibe û xênî banger bike ka bê ev dilop nasekinin ma em ê di vê rewşê de bin.. Ebdo hilkişiya ser xênî ka lê reşand û banger kir.. Mêvan hemû di xênî de rûniştî ne, lê diniya li wan teng bû, rêya wan di kevelê wan de nemaye him ji şerma ku ew di vî çilî de ketine ser çavê van camêran de.. Her yek di dilê xwe de dibêje halê wa nebesî wa ye em jî ketin ser çavê wan de.. ji jor bi ser wan de baran tê û binî li bav piyê wan tev bûye av, û cilikê wan çil bûne ciyê rûniştinê nemaye û ya herî dijwar mala Silo bela xwe ji wan venakin... ew ketine rewşeka ku kes nahesidiye ne şeva wa şev e û ne roja wa roj e... jiyan li ber çavên wan reş bûye wek dujihê lêhatiye nema dizanin wê çi bikin... bi ku de herin.. hin ji wan ji xwe re dibêjin ma gelo ku em vegerin Welêt wê ne çêtir e ji vê zindanê lê hema ewe em ne di zindanê de ne û Cendirme ne li dora me ne... ev bû serê çand roja em divê odê de genîbûn ...

Nema dilê wan di axavtinê de heye, gotina ku ji devê hina ji wan derdikeve jî bê dilê wa ye û bi serê zimanê xwe diaxivin û bi mehdekî tirş... ew şeva çû û roja di ser de hatî li ser wan pir giran bû.. lê tu kes kul, xewin û hêviyên xwe ji yê dî re nabêje, tevlî ku hemû li hev tînin der lê kes ya dilê xwe ji kesî re nabêje û nizane, lê madê tevan giran e û qermîçonkê rûyên wan ji mirov re dibêjin sed kul û xewin û hêviyên nîvco di serê min de hene, lê ez ji te re nabêjim... her yek ji xwe dipirse ma ev kul û xewin û hêviyê nîvco di serê hevalên min de jî hene yan na.... Hin ji wan di dilê xwe de poşman bûne, bê hêvî bûne, li hatina xweya li bin xetê lê xuya dike ew poşmanî bi xwe jî nema sûde dike, lê ji hevalên xwe re hişkere nakin, û nizanin wê çawa poşmaniya xwe di wê rewşa derûnî de ji hevalên xwe re bêjin. Rewşa wan pir nexweş bûye, rê û rêbar li ber wan têne girtin, baran rê nade wan ku ji gundê Cirnikê derkevin û bi rêya xwe de herin heger li Welêt û yan bi Ewropan de.... di nav destên wa de rehin bûye.. ew zilamên ku beriya demakî di çiya û bajarê Kurdistanê de weka lehinga bûn îro ketine çi davikê... carna dikeve bîra hineka ji wan ku ev davik hina li ber wan vedabe û hayê wan jê nebe lê ka wê çawe xwe jê xelas bikin.. hiş û sewdan di serê wan de nemaye... Remezan da xwe rabû. Hisên jê re got: tê çi bike....!? Remezan got: ez ê binêrim ka Ebdo çi kir bila ji ser bên were xwar ez ditirsim xanî di bin lingê wî de herin xwar û ji dêvla ku ava bike xira bike. Xaniyê ku îro sê rojin baran lêhatiye û banê kevnin û ev çend salin me pûşê wan nûnekiriye û ev barana dijwar lê hatî... Yabo min kir û nekir zaroka bi ya min nekir min digot ez ê îsal serê wan biqulpênim lê nehiştin... ma ne xwe kengî xaniyê min dilop kirine ta ku îsal dilopa dikin.. Xwedê wekala gerek mirov tu carî bi ya zarokê xwe neke... Ebdo hate xwar Hisên jê pirsî.. Ma ji derve çawa ye....!? Ebdo got: Mirov nizane ba ji ku ve tê hingî bakî dijwar û cemidi ye wek bayê berfê ye, welahî yê ku îşev ji derve razê ez bawer nakim roj li wî derkeve, wê biqufile.. Şevê wek vê min nedîtine li cem me hatîn. Mêvan di cihê xwe de mane cemidî her yek ji xwe re dibêje ma ku li vir wisa ye gelo niha li Serxetê çawa ye.. ew mane behitî ji vê baran û bayî. Yekî ji wan di pencerê re li hew şê nêrî ewir gihane erdê, bi şûn de vegeriya û berê xwe da Remezan, jê re got: Apê Remezan zivistanê we tim wisa ne....!? Remezan got: Bawer bike min nedîtiye barana wek vê baranê li binya xetê hatiye, ev ne baran e ev tofan e, Xwedê ava bike, wele mirov dibêje wê diniya xira bibe, ev ne zivistan e ev wêran e. Xwedê wekale ez gihame vî temenî hîn min ba û barana weka ba û barana vê zivistanê nedîtine…

Mêvan hemû li Remezan dinêrin û di dilê xwe de dibêjin ev şensê me ye bavo. Pê re pê re dibe şîqe şîqa ewran beledî ve didin û mirêna baranê destpê dike û beledî hewşê dikin ronî û diniya pê re pê re tarî dibe, ewir hatin li erdê sekinîn, tarîbûnek bi sehw. Xumexuma ewran, mire mira baranê, şîqeşîqa belediya diranê mirov li hev dikevin, tevzînok bi giyanê mirov de tên, bablîsok çê dibe, gupînî ji sopê tê, sope vedimire, teniya wê bi ser mêvanan de tê xwar her yek xwe didê qurcikekî û xwe ji teniyê dadiweşîne. Çûk di kunê xwe de di ber serdorê xaniya de xwe dimelisînin…, Dibe newnewa pisîkan li dora mêvana diçin û tên dûvê xwe li giyanê wan didin xwe bi wan dixwerînin... Yekî ji mêvanan got: Hûn dizanin wê van rojan gelek baran û berif were ? Hevalekê wî jê pirsî: tu ji ku dizanî..!! Wî lê vegerand got: Tê bîra min carê xitiyarên me digotin: dema ku pisîk tê xwe bi mirov dixwerîne manexwe wê berif û baran zehif were û bi rê baran ne diçûn...

Ewir hildikşin banî, baran hêdî hêdî kêm dibe diniya dibe mij, mijeke sipî û baran disekine tîrêjê rojê didin kosera xaniyan, dengê mirîşka li hewşê tê, zilamê rûnîştî li hev dinhêrin bê ku biaxivin lê di çavê her yekî de sed pirsê bê bersiv hene. Gelo ev çi ye, wê ta kengî ev baran were..? Şev li wan giran bû ew giranî li wan bû sal. Xewa kesî nayê her yek di nav cihê xwe de



dirêjkirî ye bê ku ew razê, şevek giran e her yek ji wan ji xwe re dibêje: Ev çi şevek giran e gelo ma weheye ku vê care jî em rojê bibînin yan wê diniya xira bibe û em li binya xetê li deriya li biyaniyê…!

Hemî bi cilê xwe ve raketine karê xwe û çûnê kirne lê baranê rê nedaye wa wan jî nema cilê xwe ji xwe kirine.. hin ji wan ji xwe ditirsin û hinê dî li ser mala Kabreş ditirsin û ji xwe re dibêjin ya me hal e ma ya wan çi hal e.. çima em xwe bixin bela li van feqîran ma ya wan çi ye.. hema Xwedê ji me sitandiye.. her yek derdek wî heye lê kes bikesî nizane ji her yekî we ye ku yê dî ketiye xewê û heyê wî ji vê rewşa xirab nîne... lê halbokî hemî di halê hev dene.. hemû mane şiyar ta ku roj li wan hilat, bêhna wan cardî fereh bû. hîn barana ku bi şev destpê kirî nesekiniye… lê baranek sivik e dilê wan jî hinekî xweş bû, yeka yeka derdikevin hewşê bêhna xwe piçekî ber didin û li wan Çiyayê Serxetê dinêrin ji hev re dibêjin: Çiya tarî bûne ji mij û moranê, kes di vê bandevê de ji mala xwe dernakeve. Ji lewma dilekî wan bi hatina baranê xweş e û yek bi tirs e, çimkî ew ji xwe re dibêjin ma weheye ku hin di vê ba û baranê de ji Serxetê werin me û mala Silo wa bişînin da ku ataxiyê li me bigrin û ji nişkîve li me bireşînin.. Hin ji wan xwe bi vê yekê razî dikin lê hinê dî tirsa mala Silo nemaye di dilê wan de û ji xwe re dibêjin ma wehe ye ku mala Silo ji nişkîve ew bi ser me de bigrin bê ku me haj ji xwe hebe û me teva bikujin...

Carek dî li xwe divegere û dibêje na ez yeqîn nakim ku mala Silo karibin tiştek wisa bikin ma xwe ne bûne hikumet ta ku werin derbasî sînorê Sûrî bibin û me bikujin û vegerin Serxetê... ma ev çawe çêbû.... Hemî ketine di van xem û xeyalan de... Lê tiştek bi destê wan ve nayê û xwe sipartine qederê. Taştêya xwe xwarin û ji nûv re her yek vegeran ser cihê xwe û ji Remezan re gotin: Hema nivîna nehilêne em ê di nav cihê xwe de razên. Demekê rojê rabûn ku vaye baran sekiniye û diniya venebûye... lê ewir dikelin xezeb ji ewiran tê xwarê, wek zihayê mara xwe li hev dipêçin, jêr û jor li hev dixin, diniyayê li ber çavê mirovan dikin dujeh.. Her yek li ser nivînê xwe rûniştiye û çixara wî di destê wî de ye..dema ku mizê li çixarê dixin dûyê çixarê li ser serê wan dibe weka kufendîla û li hev dizîvirê ta ku diçe xwe bi zikê xênî ve digre.. ode tarî bûye ji dûyê çixarê wan. Çavê wa ji dû dişewitin dibe kuxte-kutxa hina ji wa dûyê çixarê di ber wan de dimîne.. ew bi xwe ji tirsa ye.. simbêlê hina ji wan zer bûne ji dûyê çixara. Simbêl bi xwe dirêj in û devê xwediyê wa simbêla xuya nake..çavê wan dizerwilin neynokê wan dirêj bûne di ber wan de tijî gemar bûye... xuya ye ku ji demek dirêj de xwe neşiştine.. berstikê qemîsê wa gemarê girtiye pantiron qermiçiye hin ji wan qulek yan di qul di gorê wan bûne.. ev hemî nîşana perîşaniyê ye. hin ji wan dema ku li xwe dinêrin heyecan wa digre û hêrsê wî dadikevin ji desthilanî dikevin nema xwe li ser lingê xwe digrin....

Ber êvarê Şikriyê kurê Remezan û bavê Hemze dane derê malê, silav li mêvanan kirin Şikrî çû destê bavê xwe û li hal û demê hev pirsîn, lê dema ku bavê Hemze derbasî xênî bû û çav li hevalên xwe kir matmayî ma ji dîtina wan hevalan li wir....!? Bavê Hemze deng nekir, silav li wan kir di nav wan de birayê wî yê mezin e… Bavê Hemze ew ji Serxetê bi Şikrî re hatiye hîn çek ji xwe re bibe. Ew nizane ku ev qas hevalên wî û birayê wî jî bi wan re ye û hemû li mala Remezanê Kabreş in û ne Şikrî dizane ku ew mêvan li mala wan e. Şikrî bavê Hemze bi zorê bi xwe re aniye malê çimkî ew hevalê wî yê rê bû û gotiye were çayekî vexwe û bi rêya xwe de here. Lê dema ku bavê Hemze dî wan ew heval hemû li xwe li wir berda erdê. Ew jî ma li wir, ew nizane ku ew heval hatine çi û wê bi ku de herin.

Bavê Hemze ji dîtina wan li biniya xetê behitî, di dilê xwe de got: Çima ez ji wan napirsim ka ew hatine çi!? Ji wan re got: Xêr e hûnê bi ku de herin û ji kengî ve hûn hatine vir…!? Bavê Hemze jî yek ji hevalê rêxistinê ye, ji partiya Kawa ye û ew heval jî yê rêxistina Kawa ne.... Yekî jê re got: Va bû serê du sê roja em li vir in û em hatine em ê herin Ewropa ma te nizanîbû em li vir in…

Bavê Hemze got: Na wele heyê min ji hatina we nebû ku hûn li vir in. Û ez nedihatim lê Şikrî ez bi zorê bi xwe re anîme…..! Hisên jê re got: Me ji hevalan re negotiye em ê herin binxetê û ji wir em ê herin Ewropa. Bavê Hemze berê xwe da birayê xwe û jê pirsî: Çima te ji min re negot: Va ez ê herim te haj zaroka hebe. Birayê wî got: Ma ev çiqase me hev nedîtiye, ma ez ê di ku re ji te re bêjim? Hisên ji wan re got: Ne xem e, vê mijarê bigrin, va we hev dît û Hisên ji wan re axivî li ser Turkiya û Kurdistanê û rewşa nû piştî hatina Conta Leşkerî bi serokatiya Kinhan Êvrên… Civat li bavê Hemze jî xweş hat. Havlê wî jê li malê xwe rûniştine û wê miletê me dev ji Kurdistanê berde... madem em hene wê ev pirs hebe û tucarî em dev ji milet û Welatê xwe bernadin.. Binê heval miletê me ji sedê sala ve berxwedanê dike û gelek qurbanî daye.. Di baweriya min de ev milet nema dimre ne mumkine ji nû de ku kurd piştî vêqas kedê ji berxwedana ji ser hildana.. lê heger ku baweriyê te zehîf bûbin ev tişteka dî ye.. Çimkî îro bi hezara xwendevanê me çêbûne û mafê xwe nas kirine û bi seda ji miletê me.. Û kesên zane li cîhanê bela bûne nexasim li Ewropa. Miletê ku xwîn di ber mafê xwe de rijandibe ne mumkin e ku bi hêsanî dev jê berde... rast e em îro ji Kurdistanê derdikevin lê emê lê vegerin û em qebûl nakin ku xwîna miletê me bi arzanî here.. me soz ji miletê xwe re daye ta ku xwîn di damarê me de hebe em ji pey doza xwe venagerin... Îca dev ji va ramanê xerab berde ji xwe yekê weka te şerme wisa birame... Vê carê ez vê ji te qebûl bikim lê carek dî nabe tu wisa birame... Bû nêzîkî êvarî û careka dî baranê ji erd û ezman dest pê kir gelî dagirtin, bû xumxuma çeman, şîqe şîqa tavan.. Hisên serê xwe xiste şebakê de û li baranê dinêrî, hişê wî çû kete çol û çiya xewa li hin dar û deviyan, ew zivistanên Kurdistanê yên dirê jn, ew berf û baran, lê wek vê baranê nedîtiye, vegeriya hat cihê xwe rûnişt û ji hevalê xwe re got: Bawer bikin em mane li vir, xuya dike baran rê nade me ku em ber xwe bibînin..! Remezan got: ma çi li pey we heye? Hûn li mala xwe re êvara bi qeremaça û bi gustîlk mijûl dibin ta Xwedê çê bike, ma ferman e.... Heger hûn ji dilopa aciz dibin ev jî heqê we ye lê ez dibêjim belkî Ebdo ew jî sekinandin... Hemû li dora sopa xwe rûniştîne û guhê wan li ser baranê ye Şikriya jî hat li cem Hisên rûnişt...

Herdû bûk û zavayê nû ne, ev nebûye demek dirêj Şikriya mêr kiriye, hîn ew û zilamê xwe ji hev têr nebûne, ji lewma dixwazin ku carnan bi tenê bimînin, lê bi dest wan nakeve û cî li wan teng bûye... Çimkî herdû jî nûner in di partiya Kawa de û hevalê wan li dora wan in, mecbûr in ku di nav hevalên xwe de bimînin û şîreta li wan bikin û hêrsê wan bilind bikin, û ji wan re dibêjin ev hemû ji wê berxwedana ku bav û kalan di kurahiya dîrokê de kiriye, ji lewma îro em hene û dihna xwe bidin dîrokê ka ew miletê ku li ser vê axê xwedî nav û deng bûn, xwedî kelih û tac bûn, xwedî leşker bûn, qiral bûn, beg bûn, Mîr bûn. Lê hina ji wan navê xwe di dîrokê de bixwîne nivîsandaniye û hina bi şaristaniyê û wek hêviyê û kedê bi şûn xwe de hiştine, lê îro ew nemane çimkî wan nikarî wek bav û kalên me berxwedanê bikin.. û di jiyaneka serbixwe de berdewam bikin ji lewra hin ji xwediyê îmberatorên ku bi hêz bûn îro heliyane û ew têne jimartin li ser tiliyan... Lê miletê me dikarîbû xwe biparêzê û berdewam bike di jiyanê de wek miletek xwedî dîrok xwedî ziman xwedî erd.. ji ber vêyekê gerek em jî wek bav û kalên xwe berxwedanê bikin ta ku em welatê xwe azad bikin û bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivin... ma ne şerm e ku miletek biqasî miletê Kurd ta îro mabe bindest ma ta kengî wê ev miletê perîşan bimîne di bin destê hov û xwînxwaran de... Dijminê me hov in xwînxwar in.. ma ta kengî emê li ber deriyê dijminê xwe bin em ê xulamê wan bin ma ta kengî ew ê keda me bixwin û em ê birçî bin... Bi rastî miletê me netewa xwe nas kiriye û miletê me sax e ne mirî ye û nema dimre...

Remezan bang kire Emîna û jê re got: Ka çeydan dagire av em ê deynin ser sopê çaya li ser sopê xweş e... Emîna çeydanê mezin dagirte av û anî denî ser sopê.. Şikrî hin berû bi xwe re ji Serxetê anîbûn. Emîna legenek anî li ber Remezan danî û gotiyê: Ji xwe re deynin ser sopê wê biqemirin, xweş in. Remezan rahişte hin berû danîne dora çeydan. Dema ku Hisên çav li berûya kir.. ji Remezan re got: Ev berû ji Kurdistana Serxetê hatine... hevalekî wî pirsî? çawa tu dizanî hevalê Hisên...? Hisên lê qulipî û jê re got: Ji ber ku berû li Kurdistana bixetê nîn in û min colociya li zangoyê xwendiye ji lewma ez baş cuxrafiya Kurdistanê nas dikim... De ka guhê xwe bidin min ez ê ji we re bêjim... û destpê kir, ji wan re li ser dar û deviyên Kurdsitanê û çiya yê Kurdistanê, deşt û newal, av û kanî, û fêkiyên ku li Kurdistanê çê dibin axivî. Hevalê wî jî mane guhdar nexasim yê ku beriya niha ew nas nedikirin û nedizanîn ku rêberê wan hewqas rewşenbîrekî bilind û zîrek e… Hisên li ser çem kanî av û hewînga diaxive....

Hisên biste diaxive û hemî piştrast in ji ber ku ev serê sê roja ye baran e û teva ji hev re gotiye em bawer nakin ku di vê baranê de kes ji malê xwe derkeve ji lewma Ebdo neçûye nobetê û di wan rojê baranê de ser bestbûn... tubî turs ji wan re çênedibû.....

Serxetî hatin hewşê, Hemo û hevalê xwe jî bi alîkariya hina ji gundiya yan hin ji wê derdorê û di bin perê şevê de di wê baranê de hatine û di ser dîwarê rojhilat re yê hewşê re derbasî hewşê bûne û li hewşê gerane tiştek neditine.... Ji ber yê ku ew derbasî hewşê kirine ji wan re gotiye mala Kabreş beriya çend roja nobedarî li xwe digirtin lê wek ku me qelewîz li wan girtî di van rojê baranê de nema qelewîzê li xwe digrin... Lê tevlî wisa jî dema ku hûn derbasî hewşê bibin we haj ji xwe hebe û pêşî baş li hewşê bigerin beriya ku hûn gullekî berdin.... Hemo hevalê xwe li hewşê bela kirin teva ciyê xwe girtine û tivingê xwe amade kirine li birine ber û li benda ku Hemo ji wan re bêje dest bi kuştinê bikin... Hemo dîwar dîwar çû li ber şebakê sekinî û guhê xwe da ser odê dî wa Hisên ji hevalê xwe re daxive li ser Kurdistanê.... Hemo di ber xwe de got: Bi serê bavê te ku Xwedê min nekuje min nehişt tu careka dî li ser Kurdistanê baxive û te Kurdistana xwe nedît... ez Hemo me ez ê gewdê te bişênim Kurdistana te, na çima gewd nawele ez ê hestiyê te bişînim bi ser dayîka te de... Bi Xwedê Hisêno min nehişt ku ji vê kêlîkê pê ve gotina Kurdistanê bînê ser zimanê xwe.... Hemo serê xwe hinekî bilind kir dî wa Xoce jî li kêleka wî ya çapê rûniştiye... Ji xwe re got: Pir başe bila hûn wisa di nav zilaman de rûnin, wele ezê gewdê te kunkunî bikim û bişînim ji bavê te re.. Hûnê Kurdistana çûk in, merhebe bi Kurdistanê.. Hemo xwe hinekî bi şûn de da û ji hevalê xwe re got: Li wan bireşînin..

Hisên di gotinê de gerim bûye û dixwaze ku gotinê wî bandora xwe li hemî hevala bike tevlî zarokê Remezan jî, ew jî ji xwe re dibêje ez li fersendeka wisa digeram ku ez di nav xelkê Sûrî de baxivim ji lewma ew pir bi zanebûn gotinê xwe dineqîne da ku gotin yek ser derbasî mejiyê wan bibe.... Ê mirov derziyê li odê berdê wê dengê wê were hingî kesê di odê de guhê xwe dane ser Hisên û bihna xwe wek diza dibin û tînin... Hisên jî di nav gotinê xwe re carna bi ser rêxistinê dî de dişkîne lê hêdî hêdî û her serê kêlîkî li çavê guhdara dimeyzîne.... Ew dixwaze yê guhdar bi wî re indîmac bibin nexasim zaroyê Remezan...

Dîtina wan dîtî gulle di şebakê re, di derî re wek baranê bi ser serê wan de hatin… Rê û rêbarî li ber wan hatin girtin, nema karin ji cihê xwe rabin…..!

Luqman Silêman

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelali

Birawo .. Yê Koçber Ez Im..! (2+5)



Silêman Azer

Bajarê Nisêbînê rabûye ser xwe û xwepêşandan li dar e, wek gelek caran ku milet dadikeve kolanan hemberî kiryarên dewleta Turkî dijî miletê Kurd, û vê carê jî dijî herifandina peykerê şehîd Egid bû,û tu li kolanên bajar digerî, Nisêbîna ku bi dehên caran tu pê hest dibûyî û bîna wê dikir dema ku tu diçûyî mala hevalê xwe, yê ku mala wî li dawiya bajar bû ji aliyê Bakur de, erê tu li wir bûyî lê niha tu dinava kolanên wê de yî û li çayxanekê tu çaya wê vedixwî.

Tu û hevalê xwe yê ku berî çend mehan ew û malbata xwe ji Qamişlo koçber bûne mîna gelek malbatan piştî destpêkirina krîza Sûriyê û li Nisêbînê bi cih bûne, kolanên bajar derbas dikin û poz û çavê we ji bîna bombeyê xazê dişewite, lê win dixwazin dev ji van kolanan bernedin.

Yekemîn şev tu li welatekî dîtir, li bajarekî dîtir tu pêrgî bêrîkirin û hestên koçberbûna xwe dibe.

Ji pencerê ve roniya mizgefta Zeyinelabdîn hêsirin gerim bigewriya te de berdidin, çendîn car tu û zarokên xwe dibere derbasbûn û we tiştin hînik dikirin an çend kulorîk mușbek di demsala zivistanê de, û niha tu ji dûr ve lê dinerî û gelo vê şevê zarokên min bi çi hest dibin û çawa yekem şeva xwe piştî dûrbûna min derbas dikin.

Li ser telefonê zaroka te yî biçûk gazinên xwe dike: Yabo diya min hîn ji êvarî ve derî li me dadaye û em li hundir rûniştîne, tu wan hêsirên ku di çavên wê de asê bû bûn di dema xatirxwestinê didaqurtîne û çavên te di aso de difitirin û ew li asîmanekî giravî wilo li te dibarin:

Zevoka min
ew çavên te yî pingehayî di kêlîkên
xatirxwestinê de
şapekin
îro ji asîmanê Sitenbolê dibare
û min radestî hêcbûna pêlên deryaya spî dikin.

Hevalê te bi taybetmendiya rewşa te hest dibe û bi henekî dibêje: Bi rastî te bêriya Zevînê û zarokan kiriye an diya wan..hhhhhh.?

Şev we radestî siyset û helbestan dike, çîrokên koçberiyê û rewşa awarte ya welat û bajarê we. Gelo çima û ji bo çi win gihane vê asta kambax û koçberbûn bûye baştirîn bijarte di jiyanê de, pirs in belkî bersiva wan zortir be ji sedemên wan bi xwe. Diya hevalê te jî ya diltenik û dilovan tevî wan êş û birînan dibe, û bi we re çîrokên koçberbûnê dihûne.

Wek sazbendan dema ku zivistanan birçî dibin dawetên havînê tînin bîra xwe, win jî kêlîkên şahî û kêfxweşiyan li bîra xwe tînin, win xwe ji xeman mezintir dibînin, û hewil didin bi devkeniyê kiwara xeman bigrin da bi kêlîkên we ve nedin, lê tîpên gotinan bi lêvên we ve dilekin û bi giranî xwe berdidin pêlên bihîstinê.

Hevalê te dest bi xwendina helbestan dike û çavên te di wê minareyê de çikilîne, tu kêlîkan bi wan kolanan re derbas dikî.

Şev di wî cihî de dilûse û xilmaşî birînadare bi têlên sînor, tu birçiyê bîrîkirinê yî û tenêbûn careke dîtir serê xwe datîne ser bêdengiyê, xilmaşî radikeve lê xewa bêrîkirin û tenêbûnê nayê.

Tu li Basê siwar dibe û dîse rûbirûyî xatirxwestinê tê, û ew pirsa hevalê te û malbata wî pirsa bavê te tînin bîra te di dema xatirxwestinê de: Kurê min çima tu yê koçber bibe, ma çi ji te kême, û ma tê min û vê diya xwe yî pîr ji kê re bihêlî, em mirîne lawo û bikêrî xwe nayên….şapek çavên te bindest dike û xwêsiya te di gewriya te de asê dike, firendeyên te basko dibin û te bazê xwe di mijekê dev berda, erê bi rastî çima yabo……..?

Ciwan û Partiyên Kurdî

«Bêguman ev nêrîna min nê wateya ku gerek ciwan nekevin partiyan. Na.., gelê Kurd hewceyê partiyan e, serokan e, lê a ku ez dibêjim, bila ciwan kesayetiya xwe biparêzin, zêdetirîn bi raman û kultûrê de werin girêdan».

Salih Bozan

Di jiyanê de em giş li rastiyê digerin. Lê ciwan ji hemûyan bihtir li rastiyê digerin. Ji ber ku ciwan zêdetirîn dilsoz in, û dixwazin bi rastiyê re bijîn. Lê problema ciwana ya mezin bingeha wan ya ramyarî û kulturî zebûn e. Loma bi lez dişemitin rewşên tevlihev, pir caran dikevin dijî taybetiya xwe. Bi hêsanî dibin nêçîrên nêçirvanên siyasetmedar. Em dizanin bingeha hemû partiyan ciwan in. Ev rewşa partiyên Kurdî ne jî. Her partiyek bi ciwanên xwe li ser zemîn xebatê dike. Ji ber ku ciwan hêza guhartina hemû rewşa civatê ye. Partiyên me yên Kurd taybetiyeke xwe heye. Ew dijberî hevdu ne. Xaziya doza wan yeke jî, lê ew hevdu dijmin dihesibînin. Hêza ku di vê dijberiyê de bikar tînin ciwan in. Di Facebookê de hemû nakokiyên partiyên me yên Kurdî li ser zimanê ciwanan tên gotin. Ciwanên me gor ediyolojiya partiyên xwe hevdû rexne dikin, tewanbar dikin, û gellek bêbextiyan li hevdu dikin, partiyên hevdû xayîn dikin, û serokên hevdu dikin nokerên vî dijminî, wî dijminî. Ev rewşa hêza ciwanên me tarûmar dike. Wan dûrî doza Kurdî dixe. Gava tu bi van ciwanan re dikevî diyalogê, tu dibînî ku partiyên wan ti raman û kultûr nedaye wan. Ew bes dizanin serokê partiyê her yekî, lîderekî pir mezin e, bi wî re Kurd hatin cihanê, bi wî re doza Kurdî hat nasîn, û bê wî dê Kurd ji dîrokê derkevin. Min ev rewşa ciwanên me ji nêz ve şopand. Ev ciwanan tiştekî xwe yê taybet dervayî partiyên wan nîne. Jiyana wan dirûşmên partiya ne, nêrînên wan, nêrînê serokên wan in. Û gava bi sedemekê ji sedeman partiyên xwe diterkînin, wê çaxê doza Kurdî jî bi tevahî diterkînin. Piranî ji wan, wê çaxê, ne bes dijî partiyên xwe derdikevin, belam dijî Kurdewariyê giş derdikevin. Dibe ku di partiyên xwe de çîşkî li ser zimanê Kurdî dixebitin, bi Kurdî dixunin, dinvîsîn. Lê piştî dûrî partiyên xwe dikevin, dûrî zimanê Kurdî jî dikevin.

Gelo Sedem Çi Ye?

Sedema yekem, ev ciwanan Kurdîtiyê di partiyên xwe de dibînin, weke ku dervayî partiyê Kurdîtî nîne. Ji ber ku partiyên wan ew fêr kirin Kurdîtî partî ye, û dervayî partiyê nîn e. Gava partiyên xwe diterkînin, ew Kurdîtiya xwe jî diterkînin. Lê ku partî wan diqewitîne, ew li cem wan tê wateya, ku ji Kurdîtiye jî hatin qewitandin.

Sedema duyem, ew di partiyên xwe de negihîştin wê rastiyê, ku gel kesayeteke cûdayî partiya ne. Gel kesayeteke berdewam e, cawîdan e, a partî demdar e, weke mirovan pîr dibe, û paşê dimir e, şûna xwe dide partiyên nû, ên ku berjewendiya gel a nûjen ava dike.

Sedema sêyem, van ciwanan di jiyana xwe de, bi taybetî di dema partîtiya xwe de, raman û kultûrên cûda nexwendine, loma li dervayî partiyan hest dibin, ku mirovên vala nin. Min pir Kurdên weha dîtin. Deh, panzdeh salan di partiyekê de xebitine, lê xeyne diruşmên partiyê, derhojên serokên xwe, nav û çîrokên hevalên xwe tiştekî din ê hêja nizanin. Baweriya xwe bi tiştekî êdî nînin. Heta tu karî bibêjî li nanê xwe tenê digerin, û bi çi rê yê be, li cem wan ne girîng e.

Bêguman ev nêrîna min nê wateya ku gerek ciwan nekevin partiyan. Na.., gelê Kurd hewceyê partiyan e, serokan e, lê a ku ez dibêjim, bila ciwan kesayetiya xwe biparêzin, zêdetirîn bi raman û kultûrê de weren girêdan. Sedemek ji sedemên ku partiyên me li rojava ji rewşa şoreşgeriyê dişemitin diktatoriyê ew e, ku endamên van partiyan kesayetiya xwe di partiyê de wenda kirine. Mejiyên wan azad naxebite. wan bi vîna xwe, xwe kirine reben.

Şer û Têkliyên Civakî.. Civaka Kurdî Li Rojavayî Kurdistanê Wek Nimûne

Gava rêveçûna civakê dilikume, kelem û newalên kûr tên dîtin û ew sazûmana nepenî di nav kesayetên hevgirtî de dihêrive, yan têkiliyên rastgo qedexe dibin, tiştek li holê ji bilî dengê fişek û hewarê pê ve namîne. Li gor pîvan û yasayên ku zanyar û zanistan ji civakê re danîne, çênabe em civaka xwe ji dîroka wê ya mirovane veqetînin yan dûrkin.

Mihemed Şêxo

Giringiya vê mijarê ji giringiya armancên wê ye, ew yên lîstikên neyêr tarûmar bike, çawa dixwaze milet ji hêviyan riswa bike, wî tertûbela bike, da her kes li xwesteka xwe ya kesayetî bigere. Yek li vir dikare bipirse çawa di vê mij û moranê de, çilo mirov dikare vê danasînê di rewşeke awarte de bi saxlemî destê xwe deyne ser birînan û derman ji wan re bibîne, Rewşa Rojava: Civaka kurdî mîna çêleke bi şîr e, her hêzeke cengê dixwaze çend meşk dew ji şîrê wê bikeyîne. Ango xortên wê bike wek êzingên şer û hinin ji wan ta pileyeke bilind di vê keysebaziyê de biserketin bi dest xwe xistine. Ev yek di demekê de tê ku civaka Kurdî berî Şoreşa Sûryê ji her tebekan heye, dema ew liqasî zordariyeke tund hatin û jiyana wan ya bi mayînê ve girêdayî bê armanckirin. Ew Teba zûbizû xwe nêzî hev dikin û weke xelekeke bi hêz li ber xwe didin, yan xwe didin nasîn. Ev jihevnêzîkbûn li cem miletê me kêm dibe!!!! Gelo çima?!!! Helbet rola rêxistinan û serkirdeyên wan li vir serekeye, çimkî wan sincirandina hest û derûnan sar kirin û serhildanên xortan kedî kirin. Mendal: Dema rewşa malê di xirecirê de be, bav bê kar be, dê bê çeng û per be, zarok bêhêvî mezin dibe, derfet jê re nîne ku mezin jî bibe, çimkî xwendina ku jê re wek xewnekê bû, desthilata Rêjîmê dibistanên Kurdî qelb û nerastgo dibîne!

Çi rê li pêş wî dimîne?? Dê û bav ji paşeroja zarokên xwe her nîrî, çiqas dijwar be, dipejirînin, lê ku paşeroj nepenî be bêdilê xwe berê xwe didin riya biyaniyê. Çareserî: Pêwist e desthilata Kurdî ya Tev-Demê bighe baweriyeke riyal, ez dibêjim ew vî tiştî bipelînin, ku mafê hê ji wan cida heye ku bi wan re desthilat be yan hevparê biryarê be, ew tabloya birakujiyê bê jibîrkirin û hevpejirandin çawa ew daxwaza milet e, her du alî rêzê jê re bigrin, lê herêm li ber guhertinên dîrokî ye, da dîse mîna çarzemana ew neçine tilihên xwe bi geza..!

Dijminê Me Nesîbê Xwe Ji Mirovatiyê Negirtiye!..

Dijayetî peyveke tûj e, giran e û qaseke pir ji neheziyê di nava xwe dihewîne. Lê mixabin em weke netwa Kurd di nava dorpêçkirina dijminan de jiyan dikin! Rast e ev hevokeke tûj e û mirov tê de şaş dimîne, lê ez ê ji hevokê dûrtir herim û ez ê bibêjim ku ev dijmin nesîbê xwe ji mirovatiyê negirtiye! Mînakê vê mijarê ya herî beloq jî di aloziya Sûrî de xwe nîşan dide, ev e ٤ sal in sûrî (Rojava jî tê de); dişewite. Ev e ٤ sal in rêjîm û dijberên wê di nava şerekî bê sinc de ne, her du alî lawaz bûne û ta anha nediyar e wê kî ji wan bi ser bikeve; tevî wilo jî ne rêjîm, ne dijberên wî tu helwest derheqê gelê Kurd diyar nekirine her wiha her du alî Kurdan nasnakin. Ev tê wateya ku şer û pevçûn ne ji bo guhartina hişmendiyê bû yan jî ev şoreşa Sûrî ne şoreş e; tenê şer e bi mebesta guhartina serokê (guhartina serokê Elewî bi serokekî Sunî). Êdî ev wêrana li Sûrî ehmeqî derbas kir!

Netewa Kurd li ser xaka Kurdistanê jiyaneke tevlihev dijî, ew hêjî hêviyan ji her du aliyan dike, lê mixabin her du alî – rêjîm û dijberên wî – Kurdan nas nakin, û her ku mijara Kurdan li maseya gotûbêjkirinê tê vegotin vê hevokê dibêjin: « Em ê vê mijarê di parlemetoya nû de gotûbêj bikin». Di nêrîna min de ev rev e, ji bersivê direvin! Mixabin gelê Kurd di nava lanetekê de jiyan dike; ramanên bi lanet, kiryarên bi lanet û tevgera bi lanet! Hizirîna şeytanan gelê me dorpêç dike, her wiha ev gel jî bi xwe jî hizirîneke bi lanet jiyan dike. Çimkî nakokî di nav Kurdan de heye, ez

Şêrko Ebdulrehman

nabêjim nakokî tiştekî şaş e lê belê nakokî li ser rêgezan nabe. Nakokî li ser erd û ziman nabe.

Di vê mehê de dewleta Tirk mijara Rojava xistiye rojeva xwe de û wiha dibêje: « Gelê Kurd bangewaziya me dike da ku em wî ji desthilatdariya PYD`ê rizgar bikin, çimkî PYD`e dixwaze civakeke xwedê nenas biafirîne». Vê carê dewleta Tirk dixwaze gelê Rojava bi temamî qir bike, hinceta wê jî ev e «ew gawir in»! Ma gelo ev dewleta Tirk peywira xudan bi dest xistiye!

Lewma ez tekez dikim ku ev cureya dijminan ji mirovatiyê bê par mane. Lê Kurd ne bêsûc in di vê mijarê de, çimkî Kurd hizirînên dijminan dipejirînin û ramanên dijminan weke kirasekî li xwe dikin. sûca me Kurdan ku ev zêdeyî hezar salî me çanda dijmin pejirandiye û di heman demê de em dibêjin: Dijmin xerab e! Gelo eger xerab be çima em kirasê wî li xwe dikin?! Bi rastî ev nakokî ta anha bê çare ye, ji bilî hewildanên rizgarbûnê yên ku hin Kurd di riya wê de dimeşin, ev hewildan jî rastî êrîşên Kurdên ku kirasê dijmin li xwe kirine; tên.

Kirasê dijmin jî ew e; hizirîna wî ye, çanda wî ye û dibe jî ku ola wî be.

Cemîl Dahir

Tenê Serkeftin Birînên Me Yên Dûmdar Derman Dikin

Carê dema mirov dirame û bibîr tîne bê çendî serpêhatiyên me, êşên me, ewqas birînên ku di giyanên me de cihê xwe kûr kûr kolane, çi dikare van birînan der bike û rihet bike .Lê di bîranîna şewata sînema Amûdê de ya îsal û ya ket13 ê çirya paşîn û li gulistana pakrewanan ya li şûna sînema gunehkar dikeve, û di dema me ev bûyera reş bi bîr tanî, û wiha bi gotinên bi êş û hestin xemgîn ku her birîna sînemê bêtir bi jan û kul dikir .Mizgîniyek hate ragihandin ew mizgînî bû sedema ku her kes ji xweber û bi dilekî germ û bi rûwekî geş û bê hay li çepikan da , li gorî tiştê min li xwe dît û guhertina li ser derûna min peyda bû, min dizanîbû ku her kes bi wê rehetiyê hestiya û ew agirê sînemê yê bi tîn hinekî li ser dilê me sivik bû. ew mizgîniya buha û bi nirx jî rizgarkirina Şingla birîndar bi giştî ji hov û çeteyên Daişê bû, ev serkeftina mezin dikarîbû aramiyê û şahiyê bighîne giyanê hemû beşdaran û bersiva paşguhkirina gelê Kurd û hemû tiştên têkildarî vî gelî ji mirov, herêm, bajar, gund, ax , av, çem ,deşt û her tiştê bîna kurdayetiyê jê tê ji hêla ev rêcîmên zorker û necadperest ve, ev serkeftin berî her kesî diyariyeke buha bû bo giyanê pakrewanê sînemê û di eynî rojê de vê mizgîniyê bê guman guhertinek da vê rojê bi kêmanî di nerîna gelê kurd de, helbet ji îsal û pê de wê bîranîna şewatê gelekî ji reşbûna xwe deyne wê birîna wê hinekî bê hev wê şadî û kêfa vê serkeftinê ewrê dûmana şewatê ji asîmanê Amûdê biqewrîne û wê qirîn û giriyê wan zarokan bibe kenîn û li kolan, tax û hawîr wê gulistanê belav bibe.